Cihanşümul
AKADEMİ SOSYAL BİLİMLER DERGİSİ

# Lêkolîna Rexneya Edebî di Metnên Cuda yên Kovara “Peyv”ê de

# Investigating Literary Criticism in Various Texts of the Journal “Peyv”

**Yazar(lar)**

**Rabeea Ismael Khalid ZEBARI,**
Knowledge University, Iraq, e-mail : rabeea.zebary@knu.edu.iq

**Mehmet Veysi BABAYİĞİT,**
Dr. Öğrt. Üyesi, Batman Üniversitesi, e-mail: m.veysi.babayigit@gmail.com

**Yayın Bilgisi**

*Çalışma Türü: Araştırma makalesi*
*Geliş Tarihi: 28 Kasım 2021*
*Kabul Tarihi:28 Aralık 2021*
*Cilt-Sayı:2(3)*

**Atıf**

Zebarı, R. I. K., ve Babayiğit, M. V., (2021). “Lêkolîna Rexneya Edebî di Metnên Cuda yên Kovara “Peyv”ê de”, *Cihanşümul Akademi Sosyal Bilimler Dergisi*, 2 (3), 1-33.

**Öz**

Edebi eleştiri, edebiyatın bir dalı olup günümüze kadar çeşitli süreçlerden geçmiştir. Hemen hemen edebi eleştirinin her basamağında ya da aşamasında, eleştiriye ağırlıklı olarak edebi metin eşlik eder. Bu durum, edebi metinlerin gelişmesine oldukça katkıda bulunur. Edebi metin eleştirisi ile ilgili birkaç teori mevcut olup, her bir teorinin çıktısı veya işlevi; kendinden önceki teorilerin hatalarını düzeltmek veya odaklanmaktı. Ancak, günümüze kadar edebiyat eleştirisinin egemenliğinde bir değişiklik olmuştur. “Peyv” dergisi, 1991'den sonra akademik olarak ortaya çıkan dergilerden biridir. Bu dergi, genelde Kürt edebiyatının özelde edebiyat eleştirisinin gelişmesinde iyi bir rol oynar. Özellikle edebî metni, 2003'lerden sonra tenkit metotu ve teorilerine göre iyi bir şekilde işlemektedir. Dergi ile ilgili incelemeler; eleştirmenlerinin düşünce ve görüşleri açısından edebi metinleri daha fazla eleştirdiklerini göstermektedir. Bu nedenle, metnin yazarı eleştirel bir tepki içindedir. Ayrıca, bazen de birbirleriyle çekişme ya da tartışma içindedirler. Yazışmak, aslında bireyler arasında iletişim kurmanın bir aracıdır. İlaveten, teorik bakımından incelenen bu metinlere göre; yazara verilen eleştirel teorilerin oranı; metne verilen önemli teorilerden daha fazladır ve okuma daha az kullanılmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Edebi Eleştiri, Eleştiri, Badinan Gazeteciliği, “Peyv” Dergisi.

**Abstract**

Literary criticism is a branch of literature and has gone through various processes until today. In almost every step or stage of literary criticism, the literary text accompanies the criticism predominantly. This case greatly contributes to the development of literary texts. There are several theories about literary text criticism, and the output or function of each theory was to curerect or focus on previous theories. However, there has been a change in the dominance of literary criticism until today. “Peyv” journal is one of the journals having emerged academically after 1991. This journal holds a crucial role in the development of Kurdish literature in general and literary criticism in particular. Especially, the literary texts posit successful outcomes in regard with the criticism method and theories after 2003. Reviews about the journal indicates that critics are more critical of literary texts in terms of their thoughts and views. Thus, the author of the text is in a critical reaction. Also, sometimes they are in conflict or argument with each other. Cureresppondence is actually a means of communicating between individuals. In addition, accureding to these texts examined in terms of theory; proportion of critical theories given to the author is more significant than theories given to the text; however, they are less in use of reading.

**Keywords**: Literary Criticism, Criticism, Badinan Journalism, Journal “Peyv”.

**Kurte**

Rexneya edebî şaxeke wêjeyê ye û heta îro di gelek pêvajoyên cur bi cur re derbas bûye. Hema bêje di her gav an qonaxeke rexnegiriya edebî de, bi giranî nivîsa edebî li gel rexneyê ye. Ev rewş ji bo pêşdeçûna metnên edebî dibe gelek alîkar. Derbarê rexneya metinên edebî de, di encam an fonksiyona her teoriyê de çend boçûn hene; rastkirin an balkişandina wan li ser teoriyên berê bû. Lê heta îro di serdestiya rexneya edebî de guherînek çêbûye. Kovara “Peyv”ê yek ji wan kovaran e ku piştî sala 1991ê bi awayekî akademîk derketiye holê. Ev kovar di pêşketina edebiyata kurdî de, bi giştî û bi taybetî, ji bo rexneya edebî roleke baş dilîze. Bi taybetî metina edebî li gorî rêbaza rexnegiriyê û teoriyên piştî sala 2003an baş dixebite. Nirxên derbarê kovarê de; nîşan dide ku rexnegir bi raman û dîtinên xwe bêtir rexneyan li metinên edebî digirin. Ji ber vê yekê nivîskarê nivîsê di bertekeke rexneyî de ye. Di heman demê de, ew carinan bi hev re di nav nakokî an nîqaşê de ne. Nasname bi rastî navgîneke danûstendina di navbera kesan de ye. Her weha li gorî van metinên ku di warê teoriyê de hatine lêkolînkirin, rêjeya teoriyên rexneyî yên ku ji nivîskar re hatine dayîn, teoriyên girîngtir ji nivîsê re têne dayîn, û kêm caran jî karanîna xwendinê heye.

**Peyvên Sereke:** Rexneya Edebî, Rexne, Rojnamegeriya Badînan, Kovara “Peyv”.

## 1. DESTPÊK

Peyv kovareke rewşenbirî ya kurmancî ye ku bi tîpên latînî û erebî û ji aliyê Yekitiya Nivîskarên Kurd-Duhokê(YNK-Duhok), li bajarê Duhokê ku dibe paytextê devera Badînan∗ bi awayekî werzî derdikeve. Nivîskarên ji her çar parçeyên Kurdistanê, berhemên xwe di vê kovarê de belav dikin. Serpêhatiya damezirandina kovarê vedigere heta sala 1993an. Çunkî ji aliyê desteyeka nivîskarên wî çaxî ku ji kesên wekî “*Hesen Silêvanî, Xidirê Silêman, Mihsin Qoçan, Ebdilkerîm Findî, Fazil Omer, Mehemed Emîn*, *Mehemed Salih, Remezan Îza*” pêk tê, yekemîn hejmara kovara Peyvê tê weşandin. Lêbelê beriya vê, bizavên bi vî awayî, li bal YNK-Duhokê hebûn û dixwastin kovareke bi navê Peyv damezirînin. Ku ev yek wekî pirtûkekê derket holê û li ser navê “*Ehmed Ebdulla Zero*” belav bû. Îcar ji bo vê yekê Ehmed Ebdulla Zero dibêje:

*“Piştî kongireya 5an a YNKê ku di 1987an de, li bajarê Hewlêrê hatibû çêkirin. Ez wekî serokê YNK-Duhokê hatim hilbijartin û Mela Tihayê Mayî wekî cîgir hat hilbijartin û grubê nivîskaran ev bûn: “Misediq Tovî, Xelîl Duhokî, ‘Ebdilrehman Muzurî, Enwer Mihemed Tahir û hwd bûn”. Berhemên nivîskarên devera Badînan nedihatin belavkirin. Çunkî valahiyeke rojname û kovaran li deverê hebû. Egerê din, hin kovarên weke: Beyan, Rewşenbîrî Niwê, Karwan... hwd. li bajarê Bexda û Hewlêrê dihatin ji teref Wezareta Rewşenbîrî ya Iraqê ve dihatin weşandin. Îcar ev kovar bi zaravaya soranî dihatin nivîsandin. Kurmancî di nav de tune bû. Anku soranan di wî çaxî de desthilat li ser rojname û kovarên kurdî kiribû. Lewre me wekî YNK-Duhokê dixwast kovarekê derbixin, ji bo wê yekê, ku nivîskarên me bikarin berhemên xwe di nav de belav bikin. Hizir di wê yekê de kir ku navê kovarê bikin Peyv. Çunkî peyv peyveka kurmancî ye. Grubê YNK-Duhokê ev boçûna min pejirand. Me ev kovar di 1979an de, bir Bexda ji bo weşandinê. Lêbelê 1980î de weşandin. Em dibêjin ya durust kengî hatibe weşandin dîroka wê ji wir dest pê dike. Me ev kovar wekî pirtûkekê amade kir û navê hejmarê li ser nenivîsand. Çunkî weşandina kovar û rojnameyan ji wî çaxî de, ji bal dewleta Iraqê qedexe bû. Heta Rêveberiya Zêrevanî ya Weşandinê hebû. Karê wan çavdêrîkirina karê weşandinê bû. Hin caran hin mijar di pirtûkan de ret kirin û hin caran pirtûk bi tevahî dihatin retkirin. Îcar ji bal wan weşandina kovar û rojnameyan bi zimanê kurdî qedexe bû. Belku bi tinê ji bo wan kovar û rojname temam bû, ew ên ji bal Wezareta Rewşenbîrî ya Dewleta Iraqê derketin wekî Karwan, Rewşenbîrî Niwê, Beyan..hwd. Helbet ev meseleyeke siyasî bû. Îcar ev yek bû eger ku YNK-Duhokê nekare bi awayekî eşkere kovarê biweşîne. Belku me wekî pirtûk weşand. Çunkî eger me ji wan re bigota ev kovar e, nediweşandin. Lewre navê min “Ehmed Ebdulla Zero” li ser nivîsandin. Çunkî wî çaxî ez serokê YNK-Duhokê bûm. Ev bû eger ku li ser kovarê navê min bihê nivîsandin. Lê belê di pêşgotinê de îşaret bi vê yekê kiriye, ku ev ne milkê min e. Belku milkê YNK-Duhokê ye. Her weha me hejmara duduyan jî bi heman sîstemê cara pêşîn navê min “Ehmed Ebdulla Zero” li ser nivîsand û bir Bexda ji bo weşandina wê. Lêbelê mixabin ji wê yekê zanî ku ev kovar e, ne ku pirtûk e“*[1].

Helbet piştî me lêkolîn li ser dîroka kovara Peyvê kir, ev bizava YNK- Duhokê, nimûneyên di 1980î de bi navê “*Peyv*” wekî belavok dihesibînîn, ne ku wekî kovar. Çunkî di

---

- Devera Badînan yek ji deverên bi nav û deng e ji Başûrê Iraqê. Ev dever dikeve Bakûrê Rojava yê Dewleta Iraqê. Başûrê Iraqê ji aliyê nîvê rojava yê Başûrê Iraqê bi xwe ve digire. Ji sinorê Zêy Mezin û Kelaşînê li ser sinorê Îranê, ji aliyê rojhilatê ve û Rûbarê Hîzil û sînorê Surya, ji aliyê rojavayê ve û Çiyayê Meqlub, ji aliyê başûr ve heta li “*Mûsil*”ê, ji aliyê bakur ve heta sînorê Turkiyeyê. Pêwîst e wê yekê eşkere bikin, ku pêşî navê wê bi devera “*Badînan*” bi navê **“***Welatê Hekarî*” dihat nasandin. Îcar Başûrê Iraqê ê ji devera Soran û Badînan pêk dihê. Îcar devera Badînan ji Başûrê Iraqê ji bajarê Duhok, Amêdî, Zaxo, Akrê, Berderej, Şêxan, Şingal û Sêmêl, ji xwe re digire.

[1] Ehmed Ebdulla Zero, Hevpeyvîn, 7-5-2017- Yek Şem e. Duhok

pêşgotinê de ev yek ji me re eşkerekirî ye yan pênasekirî ye, ku Peyv belavok e, ne ku kovar e, dema dibêje:

*“Peyv... Ev belavoke berhemê jinûgehiştî ji dara baxê... Hêjayan eve bizava yekê ye tayê me pê radibît, dûr nîne kêm û kasî di vê hijmara yekê de ser xo rakin... Heta hijmareka dî û qefteka nû ya ji berhem û verêjêt gulistana turê kurmancî ”*[2]

Peyv wekî kovar bi awayekî akademîk ji 1993an ve derketiye holê. Lêbelê ya 1980î wekî belavok dihê hesibandin. Çunkî di pêşgotinê de bi vî away hatiye pênasekirin “*Peyv .. Ev belavoke...*” Lêbelê em dikarin bibêjin ev belavoke bû esasek ji bo kovara Peyv li piştî serhildanê. Çunkî navê wê her ji wê belavoka Peyv aniye. Fazil Omer yek ji avakerên kovara Peyvê bû, bi vî awayî dibêje:

*“Eger em bi awayekî ekadimîk xeber bideyîn, YNK-Duhok, du kovarên Peyv hebûne, Peyvek di salên 80î de, wekî komeka gotaran, bê navkirina cureeyê berhemî, hatiye weşandin, ev Peyv e bi tinê yek hejmar e jê re derdikeve û bi navê Mamostayê hêja Ehmed Ebdula Zero hatiye belavkirin, kovara Peyv a din, piştî serheldana Başûrê Iraqê hatiye weşandin û navê kovar jê re hatiye kirin, ku heta niha didome”*[3.]

Heta niha -dibe 2017an- ev kovar didome, 74 hejmarên wê derketine, sitafê kovarê ev in: “*Xwedî Îmtiyazê Hesen Silêvanî, Sernivîskar Şukirî Şehbaz, Sekirtêrê nivîsînê Hekîm ‘Ebdulla, Rêveberê Hûnerî Sitar Alî bû* ”. Her weha Desteyeka nivîskaran ev in: “*Remezan Hacî, Xalid Salih, Aştî Germavî, Guknar Elî bûn*”.

## 2. REXNEYA EDEBÎ DI KOVARA PEYVÊ DE

Ji bo destnîşankirin û polînkirina gotarên rexneya edebî di nava kovara Peyvê de, me li gorî rê û rêbazên rexneyê gotarên rexneya edebî hilbijartine. Piştre ew gotarên rexneyê tên destnîşankirin û xwendin. Em dikarin bi tenê 5 cureyan destnîşan bikin, ew jî “Rexneya Dîrokî, Civakî, Pisîkolojî, Binyadgerî, Simyolojî, Şêwazgerî, Întîbaî”. Dû re me ji hev cuda kirine û her gotarek kiriye di çarçoveyê wî cureyê rexneyê de, yê rexnegirî kar înaye. Bi vê yekê me kariye bi jimare cureyên rexneyê destnîşan bikin. Her weha bi jimare ew rexneya li ser cureyên edebî jî eşkere bikin. Piştî polînkirina gotarên rexneyê ji bo her cureyeke rexneyê me nirxandin ji wan gotaran re kiriye. Anku eşkere bikin, ku rexnegirî çawa karê rexneyê kiriye. Yek ji arîşeyên vê polînkirinê, neşehrezatiya rexnegiran bû di warê rexnegirtinê de, ku pir caran yek rê û rêbaz yan yek cureyê rexneyê kar neanîye. Belku cure tevliheviyek çêkirî ye. Bo nûmûne ji bo rexnegirtinê li ser yek teksta edebî, rexneya dîrokî, civakî tevliheviyek kiriye yan dîrokî û civakî tevliheviyek kirine û wisa. Lêbelê me ya ji hemû yan bêtir li ser tekstê ew hilbijartiye. Her wekî pêşî niha ew yek eşkere kiribû, ku kovara Peyv bi tîpên latînî û erebî dihê nivîsandin. Îcar ji bo lêkolîna xwe em ê rexneya edebî di pişka kurdî a erebî de eşkere bikin. Paşê rexneya edebî di pişka kurdî ya latînî de eşkere bikin. Her weke bi vî awayî jêrîn de:

### 2.1 Rexneya Edebî di Beşa Tîpên Kurdî yên Erebî de

Em ê gotarên rexneya edebî di beşa tîpên erebî ya kovarê de eşkere bikin. Îcar di destpêkê de em ê polîn bikin. Paşê nirxandinê jê re bikin:

---

[2] Ehmed Ebdulla Zero, Peyv, Weş. El- Hewadis, Bexda, 1980, R. 5
[3] Dr. Fazil Omer, Hevpeyvîn , 21-1-2017- Şem e. Duhok

### 2.1.1 Polînkirina Gotarên Rexneya Edebî yên Teorî di Beşa Tîpên Kurdî ya Erebî de

Rexnegirî di van gotaran de bi awayekî teorîk qala teoriyên rexneya edebî kiriye. Anku li ser pênase û pêşeng û binemayên teoriyên rexneya edebî sekiniye.

#### 2.1.1.1 Rexneya Psîkolojî

Rexneya Psîkilojî bi tenê yek gotar bi awayekê teorî dihê dîtin. Ew jî ev in:

**Xeşteya 1ê.** Rexneya Psîkilojî

| J. | J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| | 42 | Sengandina kesayetiya (Hozanvan û Rexnegirî) | Ne’metilla Hamid Nihêllî | 28 |

#### 2.1.1.2 Rexneya Hilweşîngerî

Rexneya Hilweşangerî 5 gotar in. Hemû gotar bi awayekî teorî ne. Her wekî di vî wênê jêrîn de eşkere dibe:

**Xeşteya 2 ê. Rexneya Hilweşangerî**

| J. | J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| | 32 | Cak Derrida û helweşandin | Fazil Omer | 12 |
| | 32 | Axaftin, Nivîsîn, Cudahî | Celal Mistefa | 32 |
| | 32 | Ber bi helweşandina deqî | Se’îd Osman | 40 |
| | 32 | Sîmayên rexneyî di helweşangerî da | Ne’metlla Hamid Nihêlî | 46 |
| | 32 | Bul Dî Man | Sebrî Nihêlî | 54 |

#### 2.1.1.3 Rexneya Binyadgerî

Ji Rexneya Binyadgerî 6 gotar di kovara Peyvê de berçav dibin. Hemû gotar bi awayekî teorî ne. Ew jî ev ên jêrîn in:

**Xeşteya 3 ê.** Rexneya Binyadgerî

| J. | J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| | 30 | Li dur rêbaza Binyadgeriyê | Dr. Ebdî Hacî | 8 |
| | 30 | Nijyargerî | Fazil Omer | 15 |
| | 30 | Binyadgerî û Edeb | Cela Mistefa | 35 |
| | 30 | Rexneya Binyadgerî | Ne’metilla Hamid Nihêllî | 42 |
| | 38 | Serekaniyên Binyadgeriyê | Îsmet Mihemed Bedil | 63 |

### 2.1.1.4 Rexneya Şêwazgerî

Rexneya Şêwazgerî 3 gotar in. Hemû gotar bi awayekî teorî ne. Her wekî di vî wêneyê jêrîn de eşkere dibe:

**Xeşteya 4 ê:** Rexneya Şêwazgerî

| J. | J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| | 37 | Serheldana Şêwazgerî weku aresteyeka rexneyî | Ne’metlla Hamid Nihêlî | 31 |
| | 40 | Sîmantîk: Astê ektîvkirina hozanê | Ne’metlla Hamid Nihêlî | 30 |
| | 44 | Sitayîl anku kesayetî | Sitar Elî | 61 |

### 2.1.1.5 Rexneya Bandûrî

Rexneya Bandûrî 3 gotar in. Hemû gotar bi awayekî teorî ne. Her wekî di vî wêneyê jêrîn de eşkere dibe:

**Xeşteya 5 ê.** Rexneya Bandûrî

| **J.** | **J. Kovarê** | **Nav û Nîşan** | **Nivîskar** | **Rûpel** |
|---|---|---|---|---|
| 1. | 32 | Hostatiya nivîskarî | Bavê Nazê | 60 |
| 2. | 30 | Mirina Şi’rê | Seîd Osman | 69 |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 3. | 34 | Rolê romanê... wekî mînbereka civakî | Zozan Sadiq Tirwanşî | 91 |

Bi awayekê giştî jimara rê û rêbazên rexneya edebî, ku bi awayekî teorî qala wan di kovara Peyvê de hatibe kirin dibin 17 gotar in. Ew jî ev ên jêrîn in:

Rexneya Psîkolojî 1 gotar.

Rexneya Hilweşîngerî 5 gotar.

Rexneya Binyadgerî 5 gotar.

Rexneya Şêwazgerî 3 gotar.

Rexneya Întîbaî 3 gotar.

Rêja cureyên rexneya edebî bi vî awayî eşkere dibe:

**Xeşteya 6 ê.** Cureyên Rexneya Edebî

| J. | Cureyê Rexneyê | Rêje |
|---|---|---|
| 1. | Rexneya Psîkolojî | 5, 88 % |
| | Rexneya Hilweşîngerî | 29, 41 % |
| | Rexneya Şêwazgerî | 17, 68 % |
| | Rexneya Întîba’î | 17, 64 % |
| | Sercem | % 100 |

### 2.1.2 Polînkirina Gotarên Rexneya Edebî ên Piraktîkî di Beşa Tîpên Kurdî yên Erebî de

#### 2.1.2.1 Rexneya Dîrokî

Rexne ya dîrokî bi 6 gotarên rexnê di nava kovarê de berçav dibin. 4 ji wan gotaran li ser helbestê ne û 2 ji wan li ser çîrokê ne. Her wekî bi vî away jêrîn de eşkere dibin:

**Xeşteya 7 ê.** Rexneya Dîrokî

| J. | J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Cureyê Edebî | Rûpel |
|---|---|---|---|---|---|

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | 40 | Hozanvanê Xodanê hizra netewayetî Weda'î | Dr. Kamîran Berwarî | Helbest | 22 |
| | 41 | Harmoniya demî di çîroka (Tu li çi û çi digerê ?)da | Nefîse Îsma'îl Hacî | Çîrok | 38 |
| | 41 | Bîrewerî û havîbûn di efsaneya stranên bindestiyê da | Selam Balayî | Helbest | 47 |
| | 41 | Hozanvanê gel û niştîman: Mela Ehmedê Palo | Dr. Kamîran Berwarî | Helbest | 62 |
| | 47 | Ehmedê Xanî û rexnegirtin li zamanî | Tehsîn Îbrahîm Doskî | Helbest | 8 |
| | 47 | Hewildanek ji bo vegerandina demekê pîroz | Îza Tahir | Çîrok | 112 |

### 2.1.2.2 Rexneya Civakî

Rexneya civakî bi 5 gotaran di nava kovarê de eşkere dibin û 4 ji wan gotaran li ser helbestê ne û 1 gotar jî li ser çîrokê ye. Hemû gotar bi awayê piraktîkî ne. Her wekî bi vî awayê jêrîn de eşkere dibe:

**Xeşteya 8 ê.** Rexneya Civakî

| J. | J.Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Cureyê Edebî | Rûpel |
|---|---|---|---|---|---|
| | 36 | Hejarî di Helbestên Nalbendî da | Abid Cemîl | Helbeste | |
| | | Pênç xewnên Kovilî | Hizirvan | Helbeste | 28 |
| | 34 | Xwendinek bo çîroka ez yan hîç | Dr. Arif Hîtu | Helbest | 15 |
| | 34 | Jin û bizava jinê, di hozanên Cegerxwênî da | Hacî Cehfer | Helbest | 8 |
| | 48 | Hinek çîrokên lezgîn di çîrokên Ezîz Nesîn da | Xeyrî Bozenî | Çîrok | 8 |

#### 2.1.2.3 Rexneya Psîkolojî

Rexneya Psîkolojî 2 gotar in. Her wekî di vî wêneyê jêrîn de eşkere dibe:

**Xeşteya 9 ê .** Rexneya Psîkolojî

| J. Kovarê | Mijar | Nivîskar | Cureê Edebê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 39 | Serbora Hizirvanî digel leşê mê | Ne'metilla Hamid Nihêllî | Helbest | 24 |
| 41 | Kesatiya sinêlê Kurd di heyranokan da | Ne'metilla Hamid Nihêllî | Heyranok | 76 |

#### 2.1.2.4 Rexneya Bandûrî

Rexneya bandûrî bi 29 gotaran di nava kovarê de eşkere dibe, 16 gotar li ser helbestê ne û 2 gotar li ser romanê ye û 2 gotar li ser kurteçîrokê ne û 2 gotar li ser şanoyê ne û 7' gotar li ser çîrokê ne. Wekî bi vî awayê jêrîn eşkere dibe:

**Xeşteya 10 ê.** Rexneya Bandûrî

| J. | J.Kovarê | Nav û Nîşanê Gotarê | Nivîskar | Cureyê Edebî | Rûpel |
|---|---|---|---|---|---|
| | 30 | Xwendinek bo du çîrokên gelek kurt | Sebîh Mihemed Hesen | Kurte Çîrok | 65 |
| | 30 | Xwendinek bo (Avakirina Diramî) ya şanogeriya (Sindîd berî seferê ) | Eyop Remzan Ertuşî | Şano | 103 |
| | 31 | Pênç xewnên Kovilî | Hizirvan | Helbest | 28 |
| | 31 | Suzan Semancî nihîniyekan eşkea dekat | Ehmed Mihemed Îsmaîl | Çîrok | 88 |
| | 31 | (Em) yên xapandî xwendinek di çîroka (Xwe çuyçik jî me di xapînin)ya çîroknivîs Yunisê Ehmedî | Îsa Tahir | Çîrok | 92 |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | 31 | Hozanvanê di nav hozanên Nalbendî da xo bê deng kirî | Ebdulrehman Bamernî | Helbest | 61 |
| | 32 | Aştî Gemavî li bersivan digerêt | Selam Baleyî | Helbest | 81 |
| | 32 | Firmêskekan Befir detwênewe | Çinar Nmiq | Şano | 85 |
| | 33 | Êkemîn çameya (Hozana) serbesta kurdî | Hizrvan | Helbest | 8 |
| | 33 | Dildarî û Cesaret | Zeyneb ya /Amed | Helbest | 48 |
| | 33 | Çemkî Mêbûn | Awat Hesen Emîn | Helbest | 64 |
| | 34 | Qedrî Can di wêjeya zarokan da | Mihemed Hemo | Helbest | 95 |
| | 32 | Lêgeryanek di cîhana (Mercanê )da | Nefîsa Îsmaîl Hacî | Kurte Çîrok | 76 |
| | 33 | Despêk di çîroka Folklorî û Romanê da | Dr. Ebdî Hacî | Roman | 29 |
| | 34 | Li xwe vegerînên Şîzofirenî | Dilawer Zeraq/Amed | Çîrok | 52 |
| | 34 | Hizrek û dû çîrok | Xalid Salih | Çîrok | 56 |
| | 34 | Du xwendin bu deqekê ji warê nêrgizan | Ebdilkerîm Yehya Zêbarî | Çîrok | 59 |
| | 35 | Dengvedana navê Dewleta Kurdî di hozanana kilasîkiya Kurdî da | Reşîd Findî | Helbest | 16 |
| | 36 | Demê seferjî dibîte duz | Selam Baleyî | Helbest | 21 |
| | 37 | Nizar...Havîbûn..Hejmar Sêzde | Selam Baleyî | Helbest | 26 |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | 37 | Dojeha manayan xiwendinek bo taytilên çend berhemekên Şî'rî | Hoşeng Şêx Tacir | Helbest | 41 |
| | 39 | Ebistrak û rîtma derekî di helbesta Tirîfe Doskî da | Mistefa Selîm Akrey | Helbest | 8 |
| | 40 | Xwendinek di layê edebiyê Şêx Memduhê Birîvkî de | Reşîd Findî | Helbest | 8 |
| | 40 | Hindek kevalên min di kevalê Findî da | Newzad 'Ebdilla Mizur' | Helbest | 46 |
| | 42 | Guhurîn di sitaylê nivîsna Kurteçîrokê da | 'Ebdilxaliq Siltan | Çîrok | 99 |
| | 44 | Hevrikiya kesayetî di Çavê Sêtavkê da | Loqman Asîhî | Roman | 98 |
| | 46 | Keziyên jinebî helbestên Golîzarê | Perwêz Cîhanî | Helbest | 82 |
| | 48 | Hindek xwendinên lezgîn di çîrokên Ezîz Nesîn da | Xêyrî Bozenî | Çîrok | |
| | 50 | Havîbûna azadiyê di panorama (Welatek di hewexanê ve ) da helbesta Selam Balayî | Mistefa Selîm Akreyî | Helbest | 65 |

**2.1.2.5 Rexneya Sîmyilojî**

Rexneya Sîmiyolojî bi tenê yek gotar dihê dîtin. Ew jî eva jêrê ye:

**Xeşteya 12 ê.** Rexneya Sîmyilojî

| J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Cureê Edebê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 36 | Gotara vegêranê di helbestên (Arif Hîtu) da | Ebdilkerîm Yehya Zêbarî | Helbest | 38 |

**2.1.2.6**

Rexneya Şêwazgerî bi 2 gotaran di kovara Peyvê de berçav dibin. Her du ji wan bi awayê piraktîkî ne li ser helbestê ne.

**Xeşteya 12 ê.** Rexneya Şêwazgerî

| J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Cureê Edebê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 38 | Mîkanizma alegorîkirina ranawan li çem Amîna Zikrî | Ne'metlla Hamid Nihêlî | Helbest | 48 |
| 41 | Erûza Jimarey | Mis'ud Cemîl | Helbest | 42 |

Bi awayekê giştî rexneya edebî li ser cureyên edebî wekî rêje bi vî awayî eşkere dibe:

**Xeşteya 13 ê.**

| J. | Cureê Rexnê | Gotar li ser Çîrokê | Gotar li ser Kurte Çîrokê | Gotar li ser Helbestê | Gotar li ser Romanê | Gotar li ser Şano | J. Gotaran |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Dîrokî | 2 | - | 4 | - | - | 6 |
| 2 | Civakî | 1 | - | 4 | - | - | 5 |
| 3 | Psîkolojî | - | - | 2 | - | - | 2 |
| 4 | Sîmyolojî | - | - | 1 | - | - | 1 |
| 5 | Şêwazgerî | - | - | 2 | - | - | 2 |
| 6 | Întîbaî | 7 | 2 | 16 | 2 | 2 | 29 |
| Sercem | | 9 | 2 | 29 | 2 | 2 | 44 |

Ji vê xiştеyê de ji me re eşkere bû ku jimara gotarên rexneyê bi awayekî giştî dibin 44, çend gotar ji wan jî ev in :

Çîrok 9 gotar in

Kurteçîrok 2 gotar in

Helbest 29 gotar in

Roman 2 gotar in

Şano 2 gotar in

Her weha em ê rêja her cureyeke rexneyê li ser cureyên edebî eşkere bikin. Her wekî bi vî awayê jêrîn eşkere dibe:

**Xeşteya 14 ê.**

| J. | Cureyê edebî | Rexneya Dîrokî | Rexneya Civakî | Rexneya Psîkolojî | Rexneya Simyolojî | Rexneya Şêwazgerî | Rexneya Bandûrî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Çîrok | 33, 33 % | 20% | 0% | 0 % | 0% | 20, 68 % |
| 2 | Kurteçîrok | 0 % | % 0 | 0 % | 0 % | 0 % | 6, 89 % |
| 3 | Helbest | 66, 66 % | 80 % | 100 % | 100 % | 100 % | 55, 17 % |
| 4 | Roman | 0 % | 0 % | 0 % | 0 % | % 0 | 6, 89 % |
| 5 | Şano | 0 % | 0 % | 0 % | 0 % | % 0 | 6, 89 % |

Rêja cureyên rexneya edebî bi vî awayî eşkere dibe:

**Xeşteya 15 ê.**

| 1 | Cureeyê Rexneyê | Rêje |
|---|---|---|
| 2 | Rexneya dîrokî | 13, 63 % |
| 3 | Rexneya Civakî | 11, 36% |
| 4 | Rexneya Pisikolojî | 4, 54% |
| 5 | Rexneya Şêwazgerî | 4, 54% |
| 6 | Rexneya Întîba'î | 65, 90 % |
| | Sercem | % 100 |

Bi awayekî giştî rexneya edebî li ser cureyên edebî wekî rêje bi vî awayÊ jêrîn eşkere dibe:

**Xeşteya 16 ê.**

| J. | Cureyên edebî ên rexne li ser hatine kirin | Rêje |
|---|---|---|
| 1 | Çîrok | 20, 45 % |
| 2 | Kurteçîrok | 4, 54 % |
| 3 | Helbest | 65, 90 % |
| 4 | Roman | 4, 54 % |
| 5 | Şano | 4, 54 % |

### 2.1.2.7 Rexneya Rexneyê

Ev cureyê rexneyê di nava kovarê Peyvê de dihên dîtin. Ev cureyê rexneyê diçe di çarçoveya kesayetî de û pehre bêtir ji encamê helçûnan peyda bûne. Dikarin bibêjin wekî êrişkirinekê bû li ser hevûdu bê ku têkst bibe gurepana karî. Helbet ev yek wî çaxî derdikeve dema di navbera nivîskarê têkstê û rexnegirî de nerazîbûn peyda dibe. Ku rexnegir dema rexneyekê arasteyî têksteka edebî dike û xwedî nivîskarê têkstê jê re razî nabe û wekî bersiveka nerazîbûnê li ser encam dide, ev gotarên jêrîn in:

**Xeşteya 17 ê.**

| | J. Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 1 | 31 | Awrek di pirtûka (Mirov di gêjevanka jiyanê da) | Dr. Arif Hîtu | 74 |
| 2 | 34 | Lênêrînek li dor pirtûka Ezîdyatî | Xelat Ba'edrî | 94 |
| 3 | 36 | Çend ruhinkirinek bo babetê edebê kurdî li devera Badînan | 'Ebdulrehman Bamernî | 54 |
| 4 | 37 | Şerha Mela 'Ebdulselamê Cizîrî û karekê sexte | 'Ebdulreqîb Yusif | 8 |
| 5 | 38 | Rexne û Hêrişkirin | Dr. Arif Hîtu | 10 |
| 6 | 38 | Ronkirinek li ser (Şerha mela 'Ebdiselamê Cizîrî | Mueyet Teyîb | 14 |
| 7 | 38 | Şerha Mela 'Ebdiselamî û kurte bersiveka fer | Tehsîn Îbrahîm Doskî | 17 |
| 8 | 36 | Çend ruhinkirnek bo babetî edebî kurdî li devera Badînan | 'Ebdilrehman Bamernî | 54 |
| 9 | 40 | Werin da dû caran ji rastiyê diwîr nekevîn | Mihemed Elî Yasîn | 41 |
| 10 | 42 | Dr. Fazil û Nijyargerî | Tengezarê Marînî | 32 |
| 11 | 43 | Kelhên ava ..û xwandinek | Îsma'îl Badî | 23 |
| 12 | 43 | Ziman zanîna kerib û kînê | Reşîd Findî | 50 |
| 13 | 44 | Xwendinek bo pirtûka (Çend rêyek ji bo deqî) | Ne'metilla Hamid Nihêllî | 26 |
| 14 | 44 | Xanî siyasetmedar nebûye | Hecî Cehfer | 39 |
| 15 | 45 | Belê Xanî babê siyasetmedaran bû | Dr. Kamîran Berwarî | 28 |
| 16 | 32 | Em boçî kitêban çêdikin? | Hoşeng Şêx Mihemed | 98 |
| 17 | 46 | Çen têbîniyekên rexney li dor pertûka Sîsebanê | Cemîl Şêladizî | 117 |
| 18 | 48 | Hevberkirinek deqê destnivîs û saxkiriyê Sîsebanê di pirtûka (Hizirvan) da | Cemîl Şêladizî | 53 |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 19 | 45 | “Baxê Kurda” û çend têbîniyek | Mehemed Hesen binavî | 52 |

**2.1.3 Gotarên ji Derveyî Çarçoveya Teoriyên Rexneya Edebî di Kovara Peyvê de**

Di kovara Peyvê de hin lêkolîn dihên dîtin, dûr ji teoriyên rexneya edebî de. Îcar ew jî her diçin di çarçoveya rexneya edebî de. Ew jî even jêrîn in:

**Xeşteya 18 ê.**

| J. | J.Kovarê | Nav û Nîşan | Nivîskar | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| | 32 | Kurtiyek li dor pêşdaçûna kurte çîrok û romanê li devera Badînan | ‘Ismet Mihemed Bedel | **19** |
| | 32 | Folkolor yasa Netewî ya Kurdî | Necîb Balay | 35 |
| | 32 | Qedrî Can di wêjeya zarokan de | Mihemd Hemu | **95** |
| | 32 | Edebiyata Kurdî a nûjen | Necîb Baley | **40** |
| | 35 | Edebê kurdî li devera Badîan | Fazil Omer | **21** |
| | 36 | Geryanek bi lez di nav pendên Kurdî da | Hecî Cehfer | 8 |
| | 38 | Cegerxwên jiyan  û berhem | Debas Mistefa | **36** |
| | 41 | Helbesta Kurdî li Bakûr | Berken Bereh | **18** |
| | 41 | Nefrîn di Heyranokê da | Cemîl Mihemed Şêladizî | 93 |
| | 48 | Çend runahiyek li ser xebata ( Taha Mayî ) | Wesfî Hesen Ridênî | 66 |
| | 47 | Komele çîrokên Kurdî li devera Badînan | Xalid Salih | **122** |
| | 46 | Peyvên mezinan di hozana Şêx Tahirê Şoşî  da | Hemze Şoşî | **137** |
| | 49 | Roxsarê Hozanna Kurdî(Devera Badînan) | Mes’ud Cemîl | 84 |
| | 50 | Rêbaza Simbolîzmî serheldan, binema û werar piraktîkkirin li ser deqên kurdî | Ne’metlla Hamid Nihêlî | 47 |
| | 50 | Kurte çîroka kurdî li devere Badînan | Xalid Salih | 30 |

Em ê rêjeya rexneya edebî di kovara Peyvê de, li gorî rexneya rexneyê, teoriyên rexneyê piraktîkî û teorî û ew gotarên rexneyê ji derveyî teoriyên rexneyê de hatine nivîsandin, em ê rêjeya wan di vî xişê jêrîn de eşkere bikin.

**Xeşteya 19 ê.**

| J. | Awayê Rexneya Edebî di Kovara Peyvê de | Rêje |
|---|---|---|
| | Teoriyên Rexneyê ên bi awayê Teorî | 17 gotar |
| | Teoriyên Rexneyê ên bi awayê Piraktîkî | 44 gotar |
| | Rexneya Rexnê | 19 gotar |
| | Lêkolînên Edebî ên Derveyî Teoriyên Rexneyê de | 17 gotar |
| | Sercem | 97 gotar |

Rêjeya rexneya edebî di kovara Peyvê de di beşa erebî de di vê xeştekê eşkere dibe:

**Xeşteya 20 ê.**

| J. | Awayê Rexneya Edebî di Kovara Peyvê de | Rêje |
|---|---|---|
| | Teoriyên Rexneya Edebî ên bi awayê Teorî | 17, 52 % |
| | Teoriyên Rexneya Edebî ên bi awayê Piraktîkî | 45, 36 % |
| | Rexneya Rexneyê | 19, 58 % |
| | Lêkolînên Edebî yên Derveyî Teorî Rexnê de | 17, 52 % |
| | Sercem | 100 % |

## 4. NİRXANDİNA GOTARÊN REXNEYA EDEBÎ Dİ BEŞA TÎPÊN KURDÎ YÊN EREBÎ DE

Di vir de em ê nirxandina gotarên rexneya edebî bikin. Anku wê yekê eşkere bikin ku rexnegiran karê rexneya edebî di kovara Peyvê de çawa bi encam kirine.

### 4.1 Nirxandina Gotarên Rexneya Dîrokî

Her wekî me ew yek eşkere kiriye, ku 6 gotarên rexneya dîrokî di kovara Peyvê de berçav dibin. Piraniya wan gotaran di çarçoveyê helbestê de ne. Îcar em ê li ser hin gotaran bisekinin:

**Selam Balayî** gotareke bi navê "*Bîrewerî û havîbûn di Efsaneya Stranên Bindestiyê da*" * belav kir. Di vê gotarêde rexne li ser pirtûka "*Efsaneya Stranên Bindestiyê*" ya Necîb Balayî girtiye. Di gotara xwe de rexnegirî girîngî bi naveroka helbestê daye û li ser bûyerên dîrokî

* B. N. R. Wêneyê J. 2 ê

sekiniye, anku di destpêka gotara xwe de rexnegirî îşaret bi wê yekê kiriye ku helbestvanî girîngî bi bûyerên dîrokî daye, dema dibêje:

> "*Nivîskar yêagehe li ser her bûyereka ser mîlletê wî de dihê, çunkî hêvênê têksta wî ya edebî di ser wî têkstê re derbas nabe*"[4]

Her wekî rexnegirî eşkerekirî ye havênê helbestên helbestvanî ji bûyerên dîrokî wergirtine û di helbestên xwe de qala bûyerên gelê kurd kirine. Helbet ev yek belge ye ku ev gotar diçe di rexneya dîrokî de. Paşê rexnegir tê li ser koma helbestên li ser "Efsaneya Stranên Bindestiyê" ya Necîb Balayî disekine û îşaretê bi wê yekê dike ku gelek ji wan bûyerên dîrokî bi serê gelê kurd de hatine, dike havênê helbestên xwe, dema dibêje:

"*Necîb Balayî di koma xwe ya helbestan de ewa bi navê "Efsaneya Stranên Bindestiyê" behsa gelek ji wan bûyeran dike yên bi dirêjahiya mêjûyê bi serê milletê me hatîne*"[5]

Dû re rexnegir hin helbestanan diîne ku qala bûyerên dîrokî ji me re bike, yek ji wan helbesta Duhokê ye ku rexnegirî ew yek eşkere kiriye ev helbest qala bûyera Enfalê dike, dema dibêje:

*"Di helbesta Duhokê da enfalên reş û serjêkirina bi hizaran hîviyan dianîte zimanê mirovî, di gel rojên enfalan didet naskirin, daku ew roj bi asanî ji bîra mirovê kurd naçin, dema dibêje:*

***Li ser sîngê te talan kiribûn, xewnên rengîn û mur***
***Cerdevanên peyvkuj***
***Riyên xwe di nav rêzên enfalan da veşartin ......***[6]

Her weha rexnegir her li cihekê din tekezê ji bûyerên dîrokî re dike. Helbet ev yek ji binema û yasa û destûrên rexneya dîrokî ne, dema dibêje:

"*Anku em dikarîn bêjîn taku rûpelê (365)ê terxan kiriye bo dîroka gelê xwe tomar bike, ew hejmar rojên salê ne.*
***Rûpelê çiwaran***
***Û yê pêncan û şeşan***
***Heta yê (365) an sal bi dumahî hat***
***Tu...tu ey xema giran û***
***Mergesata ezelî hûn qed bi dumahî nehatin***[7]

Li gorî rexneya civakî her rexnegirek qala civaka xwe dike. Îcar her wekî rexnegirî eşkere kiriye ku ev yek di helbesta wî ya bi navê "*Helbesta Nasname"* eşkere dibe helbestvanî qala walatê xwe dike û bêriya welatê xwe dike.

### 4.2 Nirxandina Gotarên Rexneya Civakî

Gotarek bi navê "*Jin û bizava jinê, di hozanên Ceger Xwên da*"* ji bal Hecî Ce'fer hatiye nivîsandin. Piştî ku ev gotar çend caran xwend ew yek ji me re eşkere bû ku rexnegirî qala mafê jinê di helbestên Ceger Xw î n de kiriye, dema dibêje:

---

[4] Selam Balayî, *Bîrewerî û Havîbûn di Efsaneya Stranên Bindestiyê da*, K. Peyv, J. 41, 2007, R. 47
[5] H. Ç. r. 47-48
[6] Selam Balayî, *Bîrewerî û Havîbûn di Efsaneya Stranên Bindestiyê da*, K. Peyv, J. 41, 2007, r 48
[7] H. Ç. r. 52
* B. N. R. Wêneyê J. 4 ê.

*"Çewa Ceger Xwên bergirî ji cutyar û pala kiriye, ji reş û rîta kiriye, wesa ji mafên jinan kirî ye ..."*[8]

Li vir rexnegirî wisa eşkere kiriye ku helbestvan wekî endamek ji civaka xwe qala hin bûyeran kiriye wekî mafê cotyar û paleyan, mafê jinê di civaka kurd de, civaka kurd çawa li jinan mêze dike, mafê jinan di civaka kurd de çawa ye û çawa serederî di gel jinan tê kirin. Rexnegirî qala van hemû bûyeran di gotara xwe de kiriye, dema dibêje:

"*Di helbestên Ceger Xwên de jin û mafê jinan cihek girîng û berketî digire... Dema Ceger Xwen berê xwe daye civaka kurdî, dît ku jin wekî mirovek ya çewisandî ye û kevtiye di bin nîrê zulma paşkkevtinê da, ya maye ne xwendevan, ya maye di kirasêt kevin da, werar û pêşkevtin jê re nîne, lewma di helbestên xwe de kiriye hewar û gazî, ku jin paşkevtî nemînît û biçîte qutabxaneyê bixwênît, daku serbest bijît û biçîte pêşve, îcar Ceger Xwên ji bo vê xalê dibêje:*
***Ey keçê rabe bixwêne, da tu serbest her bijî***
***Zû ji xew tu ser helîne, bes bimîne bê mejî***
***Rencbera hûndir toy, tim rind û jîr û***
***Bo te divêtin, xwendewarî û qaşî*** [9]

Di nava civaka helbestvanî de mafê jinan tune ye. Nabe jin bixwîne, belku xwendin bi tenê ji bo kuran temam e, ji bo keçan qedexe û şerm e. Îcar Ceger Xwên wekî helbestvanekî her çar parçeyên Kurdistanê geriyaye û ev bûyer rengvedaye di nava berhemê helbestvanî de, dema rexnegirî bas ji van bûyeran kir, ji encamê xwendina wî ya rexneyê bû ev yek eşkere bû. Her weha ji bo bêtir eşkerekirina yasa û destûrên rexneya civakî di gotarê de em ê nimûneyeke din wergirin ku Ceger Xwên di civakê Kurdî de qala mafê jinan kiriye û eşkere kiriye ku jin bindest e û mafê xwe tune ye, belku hemû biryar bi destê jinê ne, rexnegirî dema dibêje:

*"Ceger Xwên baş bi eş û janên jinêt jinkê kevtiye û baş têgehiştiye, ku jinka bindest e û hatiye desteserkirin, nek evroke, belku li serdemê pêxemberan heta niho, mafê wê yê xwariye, ya di kawdanên aloz da dijît"*[10]

Helbet ev bûyera tunebûna mafê jinan yek ji bûyerên civaka helbestvaniye û helbestvan nekariye xwe ji vê bûyerê dûr bike. Her wekî di gotara rexnegirî de ev yek eşkere dibe, dibêje: *"jinka bindest e û hatiye desteserkirin"*

### 4.3 Nirxandina Gotarên Rexneya Psîkolojî

**Ne'metilla Hamid Nihêllî** gotareke bi navê "*Kesatiya sinêlê Kurd di heyranokan da*"* nivîsiye û di destpêka gotara xwe de Heyranok ji me re pênase kiriye û dibêje:

"*Heyranok wekî çeqek ji folkolorî, vehînokên sade ne bo mirovî dihên arastekirin, kartêkirinê li guhdarî dikin bi rêya rîtma xwe ya xweş û mijarên pirî soz. Bi zimanekê sade û rojane tê de dihên karanîn. Wekî rêyekê bûne ji bo helçûnên xwe ên derûnî û arîşe û girîftên civakî û xwast û hezên xwe pê derbirîne "*[11]

Rexnegirî ser hin heyranokan sekiniye û rexne li gorî rê û rêbaza psîkolojî ji wan heyranokan re girtine û şirove kirine. Wekî bi vî awayê jêrîn eşkere dibe:

"***Min bo te silav hinartin***

---

[8] Hecî Ce'fer, *Jin û bizava jinê, Di Hozanên Ceger Xwên da*, K. Peyv, J. 34, 2005, r. 9
[9] H. Ç. r. 9-10
[10] Hecî Ce'fer, *Jin û bizava jinê, Di Hozanên Ceger Xwên da*, K. Peyv, J. 34, 2005, r. 10
* B. N. R. Wêneyê J. 6 ê
[11] Ne'metilla Hamid Nihêllî, *Kesatiya Sinêlê Kurd di Heyranokan da*, K. Peyv, J. 41, 2007, r. 76

***Li çiya ser êxistin***
***Li gelîya da bartin***
***Şiwîna diyarî û silava***
***Te bo min gef hinartin***

*Wî Ji ber wê bêdeshelatiya sinêley hey, desthelata bav û eşîretî sehmeka mezin di derûnê da xwe cih kir bû û sinor û çerçovên girtî bo helwîst û reftarên wî diyar kirin...*" [12]

Li vir rexnegirî eşkere kiriye ku di vê heyranokê de azadî tune ye. Anku evîndar nekarîne bi azadane qala hez û hêviyên xwe bikin, dema dibêje "wî Ji ber wê bê desthelatiya sinêley hey, desthelata bav û eşîretî sehmeka mezin di derûnê de xwe cih kir bû." Rexnegirî wisa eşkere kiriye ku mirov di qonaxa sinêlê de ye, bê desthelat e û nikare derbirînê ji hez û arezûyên xwe re bike. Helbet ev diçe di çarçoveya rexneya psîkolojî ve. Ji bo bêtir ronkirina xwendina rexnegirî ji bo van heyranokan ku diçin rexneya psîkolojî, her wekî di aliyekê din de diîne:

***'Efra li min têr kir***
***Ez çûme nav derê***
***Hew çavê min li memka ketî***
***Yarka min hevîr dikir***
***Min silava xwedê ji bîr kir***

*Balkêştirîn endamê kiçkê bo kurkî* "*Memik" in û derbirîn ji heza dîtin û awayê dîtinê bi vî rengî, heza encamdana wî bi dijwarî bo kiryara sêxsî berçav dike, dîsan bê sitarey ya keçkê jî diyar dike, ku ew hez dike yê beramber leşê wê bibît....*"[13]

Ev xwendina rexnegirî eşkere kiriye ku vê heyranokê hez û arezû ên wî kesî eşkere dike yê ev heyranokê ji me re gotî. Çunkî derbirîn ji hez û arezûyên veşartî ên xwe kiriye. Nemaze peyva "*Memkin*". Çunkî ev peyv rengvedana psîkolojî ya wî kesî ne yê ev heyranok gotiye û wî kesî bi rêya heyranokê qala hez û arezûyên xwe kiriye. Her weha rexnegirî di gotara xwe de tekez li ser hin wan heyranokan kiriye ku peyvên wekî "*Maç, Tewafa Sîng û bera, veke girêka mal doxînê*...hwd". Helbet ev peyv derbirînê ji psîkolojiya wî kesî dike yê ku ev heyranok ji me re gotiye. Her weha rexnegirî di dawiya lêkolîna xwe de ew heyranokên di gotara xwe de şirove kirine. Li gorî bîr û boçûnên Sigmund Freud kesayetiya xwedî heyranokan eşkere kir, dema dibêje: "*Eger van xala (Nişan û saloxetên kesatiya sinêlî ) rêz kin û dîtina Freud li ser peyrew kin*".[14]

### 4.4 Nirxandina Gotarên Rexneya Bandûrî

**Reşîd Findî** gotarek bi navê "*Xwendinek di layê edebiyê Şêx Memduhê Birîvkî de*"* belav kir. Reşîd Findî wekî rexnegirên din rê û rêbazên rexneyê tevlihev kirine; xwendin ji bo helbestê kiriye. Helbestên Şêx Memduhê Birîvkî li gorî rexneya dîrokî û întibahî rexne kiriye. Li gorî rêbazekê neçûye. Rexnegirî di destpêka gotara xwe de pesnê helbestvanî kiriye û bilind kiriye, dema dibêje:

"*Hinek nivîser û hozanvan dibine nûner û hêma bo serdema xo û di nav miletê xo da, em wesa dibînîn, Şêx Memduh Birîfkî, yek ji nûner û hêmaya ye di serdemê xo da, rolekê berçav gêraye, di warê edebî û hozanê da, lewma kesayetiyên mîna wî pêdivî vekolîn û li gorî çûnaberhemê wî ye....*"[15]

---

[12] Ne'metilla Hamid Nihêllî, *Kesatiya Sinêlê Kurd di Heyranokan da*, K. Peyv, J. 41, 2007, r. 77
[13] H. Ç. r 81.
[14] Ne'metilla Hamid Nihêllî, *Kesatiya Sinêlê Kurd di Heyranokan da*, K. Peyv, J. 41, 2007, r. 92
* B. N. R. Wêneyê J. 8 ê.
[15] Reşîd Findî, *Xwendinek di layê Edebiyê Şêx Memduhê Birîfkî da*, K. Peyv, J. 40, 2007, R. 8

Di vê paragrafa jorîn de rexnegirî pesnê helbestvanî û biryar li ser helbestvanî daye, dema dibêje: “Şêx Memduh Birîfkî, yek ji nûner û hêmaya ye di serdemê xo da, rolekê berçav gêraye“. Ev pesnkirin û biryardan li gorî bîr û boçûnên rexnegirî ne. Lewre diçe di çarçoveya rexneya întîbaî de. Her weha li hin cihên din jî pesnê helbestvanî dide û dibêje:

**“***Birîfkî hestnazik û melevan bû, di ristina hozana kilasîk da, herdem li esmanê pir ciwanê fir û perwaz dikirin, ciwanî û nazikî ji peyvên wî dirişt, îcar çi peyvêt xezalî yên ciwan bin di hozanê da, çi berevanî be ji mafê miletê xwe bi rêya hozanê***“**[16]

Ev paragraf hemû pesin û wesfa helbestvanî dide. Helbet ev belge ji bo wê yekê ku bandûra xwe li ser rexnegirî kiriye û rexnegirî li gorî bîr û boçûnên xwe gotarek li ser helbestên wî nivîsiye. Paşê qala wê yekê dike ku Şêx Memduhê Birîvkî bi çavên xwe dîtiye, dema dibêje:

**“***Li dumahiya jiyana xwe, çendîn caran gote min, eger delîve hebe, em bi hev re van destnivîsa sax bikin, ez ji bo we bixwînim û hûn bi rênivîsa nû binivîsînin. Paşan wê biweşînîn, lê belê çûna min ji bo nav rêzên Şoreşa Kurdî li buhara sala 1974an û zivirîna me ji bo Duhokê li buhara 1975an derfet tune bû, ji bo bicihanîna wî pirojî, ew li sala 1976ê meha nîsanê çû ber dilovaniya xwedê..***”**[17]

Helbet vê yekê çi peywendî bi mijara rexnê ve tune ye. Belku bi tenê pêzanîneke takekesî ye, dema dibêje : “*Lê belê çûna min ji bo nav rêzên Şoreşa Kurdî li buhara sala 1974an û zivirîna me ji bo Duhokê li buhara 1975an derfet tune bû, ji bo bicihanîna wî pirojî, ew li sala 1976ê meha nîsanê çû ber dilovaniya xwedê..*” Her weha her di vê gotarê de binema û yasa û destûrên rexneya dîrokî eşkere dabin. Çunkî rexnegirî bûyerên dîrokî şirove kirine û dibêje:

**“***Di hozaneka din de li bin navê “Sipêdeya Yazdê Adarê” şa’rî hesta xwe ya neteweyî diyar kiriye, ew jî piştî eşkerekirina rêkeftina di navbera serokatiya şoreşa kurdi û dewleta Îraqê da, li roja 11ê adarê sala 1970î ji bo cara yekemîn mafê otonomî ji bo kurdî hat ragehandin, hozanvan bi wê çendê dilxweş dibe û hesta wî ya neteweyî dilive û hozanekê ji bo wê rojê vedihîne û dibêje***:**

***Sipêdeya yazdê adarê, rûnkirin li me çiya û deşt***
***Şahiya serê biharê, kurdi kiriye beheşt***
***û dîsa bo rewşen mêrg û çîmen xemilînîn***
***Surperî hatine semay, xoş kirin seyran û geşt****....*

*Şêx Memduh di vê hozana ciwan û keyfxweş ya xwe de eşkere dike û sê cureyên xweşiyê tevlihev dike, xweşiya maf û wergirtina kurdan bi ragehandina otonomî li gorî wê rojê û wê rewşa û wî ser û berî û xweşiya bi gêrana ahingêt Buharê û Newrozê wekî siruştê ciwanê û şoreşa Kawey dijî Ejdehakî ....***”**[18]

## 4.5 Nirxandina Gotarên Rexneya Şêwazgerî

Gotareke bi navê “*Mîkanizma alugurkirina ranawan li çem Amîna Zikrî*” ji bal “Ne’metlla Hamid Nihêlî” ve hatiye nivîsandin. Rexnegirî di du rûpelan de qala cihnavkan di têksta edebî de kiriye. Anku rexnegir di gotara xwe de li ser rolê cihnavkan di têksta edebî de xeber daye û eşkere kiriye ku wê bi rêya cihnavkan bikarîn awa û şêwazê têksta edebî destnîşan kin, dema dibêje:

***“****Cihnavik aliyekê veşartî ji cîhana têkstê eşkere dike. Çunkî cihnavik senterên şêwazê ne****”*** [19]

[16] Reşîd Findî, *Xwendinek di layê Edebiyê Şêx Memduhê Birîfkî da***,** K. Peyv, J. 40, 2007, r.10
[17] H. Ç. r.10
[18] Reşîd Findî, *Xwendinek di layê Edebiyê Şêx Memduhê Birîfkî da***,** K. Peyv, J. 40, 2007, r.11
[19] Ne’metilla Hamid Nihêllî, *Mîkanizma alugurkirina ranawan li çem Amîna Zikrî*, K. Peyv, J.38,2006, r. 50

Di vir de yek ji yasa û destûrên girîng ji bo destnîşankirina şêwazê têkstê ew jî cihnavk in di têksta edebî de, çunkî her nivîskarek bi awa û şêwazekê serederî di gel cihnavkan dike. Derbarê vê gotarê diçe di çarçoveya rexneya şêwazgerî de. Çunkî rexnegir bi xwe vê yekê ji me re eşkere dike, dema dibêje: "*Çunkî cihnavik senterên şêwazê ne*." Her weha ji bo bêtir ronkirinê ev yek di gotara rexnegir de hatiye gotin:

*"Bikaranîna ranawa, diyardeka girînga şêwazgeriyê ye, çunkî* ranaw *şêwaz pişkdariyê di durustkirina ladaneka delalî de dike, dema ku li cihê ranaweka din digire"* [20]

Cihnavk yek ji tiştên pir girîng in di şêwazgeriyê de. Heta bi rêya cihnavkan asteke baş a wateya tekstê ji me re eşkere dibe. Anku bi rêya cihnavkan wê bi awayekî baş şêwaza nivîskarî ji me re eşkere dibe, dema dibêje:

*"Şêwazgerî ya alugorkirina ranawa weku piraktîk kirineka despak bi hejmêrîn ku dikeve di bin mîkanizma rêrewê şêwazê da.*
*Alugorkirina ranawa diçîte di nav rêrewê şêwazê da li dîf dîtina Rîfatîrî* "[21]

Di vir de ew yek ji me re bi awayekî baş eşkere bû, ku guhartina cihnavkan diçe di çarçoveya rexneya Şêwazgeriyê de, her wekî rexnegirî bi xwe ev yek eşkere kiriye, dema dibêje: "*Alugorkirina ranawa diçîte di nav rêrewê şêwazê da*". Paşê li ser jihevguhartina cihnavkan disekine û sê cureeyên jihevguhartina cihnavkan ji me re eşkere dike, dema dibêje:

- *"Alugurkirina veguhêzer:Eve ya navdare bi veguhastinna cihî li ser astê şêderbûnê.*
- *Alugorkirina lê zivrînê: weku pireka girêdere di navbera alugorkirina veguhêzer û alugorkirina jêderî da, eve jî ji bere belavtirîn teknîkên alugorkirina ranawî ye di têkstê da, hindek dibêjinê alugorkirinna raderbeder*
- *Alugorkirina jêderê ranawan: eve jî di astê jêderbûna ranawan da dihête kirin û ya hevdijî diyarda cêgîrbûna ranawaye, çunkî jêderên zimanvanî yên ranawan tê da di çêgîr nîne û veguhastin di jêderan da dihête kirin bê yekeya zimanvanî*[22]

Piştre rexnegir li ser helbesta "*Siwastîka*" ya helbestvan Emîna Zikirî disekine û helbesta wê li gorî rexneya şêwazgerî rexne dike. Çunkî helbestvanî bi awayekî baş cihnavk di helbestên xwe de kar anîne, her wekî rexnegir bi xwe dibêje:

### 4.5 Nirxandina Gotarên Rexneya Sîmiyolojî

**'Ebdilkerîm Yehya Zêbarî** gotareke bi navê "*Gotara vegêranê di helbestên ('Arif Hîtu)*[*] da nivîsandiye. Rexnegirî di vê gotarê de li gorî rexneya sîmiyolojî helbesta Jivan ya 'Arif Hîtu rexne kiriye. Her wekî rexnegirî her ji destpêka gotara xwe ew yek ji me re eşkere kiriye ku gotara xwe li gorî rexneya sîmiyolojî nivîsandiye, dema dibêje:

*"Xwendina sîmyayî, anku xwendina nîşanan wekî nîşanên giyandarên karlêkirî di nav civakî da ...."*[23]

Rexnegir li ser nîşan û îşaretan sekiniye. Anku bi awayekî din li ser hundirê têkstê sekiniye. Rexnegirî têksta edebî nekiriye rêyek ji bo şirovekirin çax û civakê têkst tê de derketiye holê, her wekî di hel beta Jivan de dibêje-:

*Xemgînim*
*Tu yê xoşî*

---

[20] H.Ç. r. 48
[21] H. Ç P. r.49
[22] Ne'metilla Hamid Nihêllî, *Mîkanizma alugurkirina ranawan li çem Amîna Zikrî*, K. Peyv, J.38,2006, r.51- 55
[*] B. N. R. Wêneyê J. 10 ê.
[23] 'Ebdılkerîm Yehya Zêbarî, *Gotara vegêranê di helbestên ('Arif Hîto) da*, K . Peyv, J. 36, 2006, R. 38

*Xewnan bi teve di bînim*
*Heku dengê zenga saatê dihêt*
*Ez bîriya bîreweriyên borî dikim û digirîm*
*Di nav hurebay da dimeşim*
*Min di înît û dibet*
*Mîna belgekê mirî û weryayî..*
*Xemgînim*
*Tuyê xoşî*
*Xewian bi teve dibînim*
*Dê kengî hêy ?...*
*Kêmtirîn peyv ji bo ciwantirîn rastî yên hevdijan bi kar aniye, ev hevdijî ye bi vî şçwazê xwarê diyar dibe:*
*(Xem) li hemberî (xoşî)*
*(Ez)li hemberî (Te)*
*(Xewna dibînim – Ez) li hemberî (bi teve di bînim- Tu).*
*(Kengî nîşana pirsiyara demî ye bi çaverê ya girêday ezî ve xe ya dibe) li hemberî(hêy –Fermaneke bi hatina yê dî paşeroja ezî da xweya dibe)*[24]

Li vir de ew yek eşkere dibe ku rexnegir têkst nekir rêyek ji bo şirovekirina çax û civakê têkst a edebî tê de derketî holê. Belku li ser têkstê bi xwe sekinî ye. Li ser nîşan îşaretan di têkstê de sekinî ye û şirovekirîne.weke*“ (Xem) li hemberî (xoşî) , (Ez)li hemberî (Te).... “ . Îcar ji ber vê yekê diçe di rexneya Sîmiyolocî de.*

Herweha di gotarê de binema û yasa û destorên rexneya Întîbaî di vê gotarê de eşkere dibin. Anku bîr û boçûnên rexnegirî di gotarê de eşkere dibin, dema dibêje:

> *“ Hestên helbestvanê hêja Dr. ‘Arif Hîtu geşedikin û dibine sîhwaneka mezin, li ezamanî hizir û aşopê di hête vedan..... ”*[25]

Helbet di vir de hest û sozên rexnegirî eşkere dibin. Anku bandûra têksta edebî li ser rexnegir eşkere dibe û rexnegir li gorî hest û sozên xwe li ser têkstê xeber dide, dema dibêje: “Hestên helbestvanê hêja Dr. ‘Arif Hîtu geşe dikin û dibine sîhwaneka mezin ...”. Helbet ev hest û sozên rexnegirî ne li ser têkstê hatine nivîsandin. Li wir ev yek diçe di çarçoveya rexneya întîbaî de. Di dawî de ew yek eşkere dibe ku rexnegirî li gorî rexneyaa sîmiyolojî rexne ji helbestê kiriye. Çunkî wî bi xwe ev yek eşkere kiriye. Anku ji nav û nîşanê lêkolîna xwe eşkera kiriye, ku wê li gorî rexneya sîmyolojî rexneya xwe kiriye. Lêbelê yasa û destûrên rexneya întîbaî jî di gotarê de eşkere dibin. Tevliheviyek di nava cureyên rexneyê de kiriye. Lê belê bêtir yasa û binemayê rexneya sîmiyolojî kar anîne.

### 4.6 Rexneya Rexneyê

Di kovara Peyvê de hin gotarên girêdayî rexneya rexneyê di xwe de dihewîne. Em ê li ser nimûneyekê bisekinin. Gotareke bi navê “*Şerha Mela ‘Ebdulselamê Cizîrî û karekî sexte*” ji bal ‘Ebdilreqîb Yusif hatiye nivîsandin. Di vê gotarê de rexneyê ji helbestvan Mueyet Teyîb, Tehsîn Îbrahîm Doskî û dezgehê weşana Spîrêz digire, ku dîwana Melayê Cizîrî weşandiye. Ew dîwan ji bal wî ve hatiye hazirkirin. Lêbelê dezgehê weşanên Spîrêz ku Mueyed Teyîb dibe serokê vê dezgehê ew pirtûk weşandiye bi navê Tehsîn Îbrahîm Doskî, dema‘Ebdilreqîb Yusif dibêje:

---

[24] ‘Ebdılkerîm Yehya Zêbarî, *Gotara vegêranê di helbestên (‘Arif Hît**o**) da*, K . Peyv, J. 36, 2006, R.39-40
[25] ‘Ebdılkerîm Yehya Zêbarî, *Gotara vegêranê di helbestên (‘Arif Hît**o**) da*, K . Peyv, J. 36, 2006,R.38

*"Ew nusxa destnivîsa şerha Mela 'Ebdilselam ya min bû. Wekî her kitêbeka din a destnivîs di kitêpxana min da hebû. Ji bo min Zîn el-'Abidîn rehmetî fotokopî kiribû û mafê çapkirna wê dabûye min û mafê çapkirina wê dabû ye min..Heqê Mueyed Teyîb nebû wê pirtûkê biweşîne bê îzna min..paşî navê Tehsîn li ser kitêba min binvîsî li batî navê min, belku diviya Tehsîn razî neba"*[26*]

Her wekî di vê paragrafa jorîn de daxwaza mafê xwe dike ku mafê wî hatiye xwarin, lewre rexneyê û hêrişa dike ser Mueyed Teyîb. Paşê hin gotarên wekî bersiv danek ji bo gotara 'Ebdilreqîb Yusif ji bal Dr. Arif Hîtu, Mueyed Teyîb û Tehsîn Îbrahîm Doskî hatine dan. Her weha Dr. Arif Hîtu di gotarekê de bi navê *"Rexne û Hêrişkirin*" nivîsiye. Destpêka gotara xwe de qala rewşa rexneyê dike û rexneya akademîk çawa ye? Paşê qala rexneya 'Ebdilreqîb Yusif dike ku ji Mueyed Teyîb girtibû, eşkere kiriye ku ev awayê rexneyê dûr e ji rexneya akademîk, dema dibêje:

*"Li hijmare 37 ya kovara Peyvê de 'Ebdilreqîb Yusif ku navekê zeqe di nava rewşenbîriya kurdî da û pisporekê şareza û xemxwarê şînwaran e, mijarek li bin navê "Şerha Mela 'Ebdilselamê Cizîrî û karekî sexte" nivîsiye. Di destpêkê de, demê mirov taytilê dixwîne dê wesa difikire ku hêjayê nivîser dê behsê Cizîrî ket û dê tîrojkên ronahî yê berdete ser şêwazê şerha Mela 'Ebdilselamê Cizîrî.....Lê belê tiştê bala piraniya nivîserên Duhokê rakêşay ew hêrşa dijwar dike ser kesayetiya Mueyed Teyîb, ku berpirsê dezgehê Sipîrêz e sernivîskarê pirojê çapkirina kitêbane û Mueyed Teyîb bi bê wefa û nerast wesif dike....."* [27*]

Helbet li vir de eşkere dibe ku di destpêkê de rexne ji gotara nivîskarî digire ku nav û nîşanê mijarê digel naveroka gotarê nagonce. Paşê bergiriyê ji Mueyed Teyîb û dezgehê Sipîrêz dike, ku xebateka baş li deverê kiriye. Her weha gotareka din bi navê "*Ronkirin li ser şerha Mela 'Ebdulselamê Cizîrî*" jî Mueyed Teyîb nivîsiye. Di vê gotarê de bersiva 'Ebdilreqîb Yusif dide bergiriyê ji xwe dike û ew tiştên 'Ebdilreqîb Yusif derbarî me û dezgehê Sipîrêz girtîn dûrin ji rastî yê, dema dibêje:

*"Di kovara Peyvê de, jimare 37, 'Ebdilreqîb Yusif nivîsarek li bin nav û nîşanê "Şerha Mela 'Ebdulselamê Cizîrî û karekî sexte" belav kiriye. Di wê nivîsarê de , bi rerib û kîneka zor û bi şêwekê kirêt hêrişê dike ser min û min bi "Bê wefa" û "Nerast" tawanbar dike...... 'Ebdilreqîb Yusif dibêje: "Navê Tehsînî li batî navê min nivîsî ye!" bila xwendevan bênêrin ji bergê kitêbê, ka ji navê Mela'Ebdulselamê Cizîrî û karekê sexte pêvetir navekê din heye? me navê kak Tehsîn Doskî li batî navê te nenivîsî ye...."*[28*]

Her weha gotareka din bi navê "*Şerha Mela'Ebdilselamê Cizîrî û kurte bersiveka fer*" ji bal Tehsîn Îbrahîm Doskî hatiye nivîsandin. Her ji nav û nîşanî eşkere dibe ku ev gotar wekî bersivdanekê ye ji bo 'Ebdilreqîb Yusif e û berevaniyê ji xwe dike, dema dibêje:

*Ez ji gotara seyday 'cêbgirtî mam û çunkî seyîday 'Ebdilreqîb bêtir ji carekê gotiye û tîkrarkirî ye: ku navê "Tehsîn Doskî li batî navê min li ser kitêbê dana ye.. ji bo emaneta zanistî pêwîste Tehsîn ji vî karî razî neba, heta rezamendî a min wergirtba..."*[29] [*] Em dikarin bibêjîn ku gotarên rexneya rexneyê diçin di çarçoveya rexneya întîbaî de.

---

[26] 'Ebdilreqîb Yusif, *Şerha Mela 'Ebdulselamê Cizîrî û karekê sexte,* K. Peyv, J. 37, 2006, R. 10-11

[*] B. N. R. Wêneyê J. 12 ê.

[27] Dr. Arif Hîtu, *Rexne û Hêrişkirin,* K. Peyv, J. 38, 2006, R. 12-13

[*] B. N. R. Wêneyê J.13 ê

[28] Mueyet Teyîb, *Ronkirin li ser şerha Mela 'ebdulselamê Cizîrî,* K. Peyv, J. 38, 2008, R. 14-15

[*] B. N. R. Wêneyê J. 14 ê

[29] Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Şerha Mela'ebdilselamê Cizîrî û kurte bersiveka fer* K. Peyv, J. 38, 2008, R. 18

[*] B. N. R. Wêneyê J. 15 ê

## 5. REXNEYA EDEBÎ Dİ BEŞA KURDÎ YA LATÎNÎ YA KOVARÊ DE

Her wekî li pêşî ew yek eşkere kiribû, ku kovara Peyv bi du beşan tê nivîsandin, beşek bi tîpên erebî û beşa din bi tîpên latînî tê nivîsandin. Îcar di vir de em ê qala rexneya edebî di beşa tîpên latînî de bikin li gorî teoriyên rexneya edebî. Di despêkê de em ê gotarên rexneya edebî di kovarê de polîn bikin û paşê nirxandinê jê re bikin, her wekî bi vî awayê jêrîn de:

### 5.1 Polînkirina Gotarên Rexneya Edebî di Beşa Kurdî ya Latînî de

Di kovara Peyvê de gotarên rexneya edebî tên dîtin. Îcar di vir de em ê wan gotaran polîn bikin li gorî teoriyên rexneya edebî, her wekî bi vî awayê jêrîn:

#### 5.1.1 Gotarên Rexneya Dîrokî

Rexneya dîrokî 4 gotar in. 3 ji wan li ser helbestê ne. Yek li ser romanê ye:

**Xeşteya 21 ê.** Gotarên Rexneya Dîrokî

| J. Kovarê | Mijar | Nivîskar | Cureyê Edebî | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 36 | Ew aşê derav lê wargêray bexçikek êşê dişewitîne | Kerem Îbrahîm El-Yosiv | Helbest | 9 |
| 39 | Aşqê kulîlkan xwandinek di helbestên Eskerê Boyik da | Heso Hurmî | Helbest | 3 |
| 40 | Nirxandina Tirsa Bêdiran, bi du çav û du hestên cuda | Qado Şêrîn | Roman | 3 |
| 44 | Ev çiya çi dibêjin û Arif Hîto | Tengezarê Marînî | Helbest | 3 |

#### 5.1.2 Gotarên Rexneya Civakî

Rexneya civakî 4 gotar in. 3 ji wan gotaran li ser helbestê ne. Yek jî li ser romanê ye. Her wekî di vî wêneyê de eşkere dibe:

**Xeşteya 22 ê.** Gotarên Rexneya Civakî

| J. Kovarê | Mijar | Nivîskar | Cureyê Edebî | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 30 | Helbestvanê tepeser û hejaran (Letîf Helmet) | Xelîl Duhok | Helbest | 3 |
| 35 | Rola wêjeyê di nava civatê de | Şhahîn Bekir Soreklî | Helbest | 3 |
| 45 | Nuredîn Zaza: Avangadardekî Çîroknûsiya | Dilawer Zeraq | Çîrok | 3 |

### 5.1.3 Gotarên Rexneya Hilweşîngerî

Rexneya Hilweşîngerî yek gotar e. Ew jî eva jêrî ye:

**Xeşteya 22 ê.** Gotarên Rexneya Hilweşîngerî

| J. Kovarê | Mijar | Nivîskar | Cureyê Edebê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 32 | Ehmedê Huseynî şêxê helbestvanên Kurd | Sebrî Silêvanî | Helbest | 3 |

### 5.1.4 Gotarên Rexneya Bandûrî

Rexneya Bandûrî 4 gotar in. Hemû piraktîkî ne û 3 li ser helbestê ne. 1 gotar li ser romanê ye. Her wekî bi vî away jêrîn de eşkere dibe:

**Xeşteya 23 ê.** Gotarên Rexneya Bandûrî

| J. Kovarê | Mijar | Nivîskar | Cureyê Edebê | Rûpel |
|---|---|---|---|---|
| 35 | Haîku | Berken Bereh | Helbest | 12 |
| 37 | Rewşa helbesta kurdî a nûjen | Lokman Polat | Helbest | 12 |
| 38 | Helbestvanî ne di bikaranîna bihtrîn gotinê de ye | Xelat Ehmed | Helbest | 9 |
| 41 | Çend rawistgehên girîng di romana kurdî da | Helîm Yûsiv | Roman | 3 |

Bi awayekê giştî rexneya edebî li ser cureyên edebî wekî rêje bi vî awayî eşkere dibe:

**Xeşteya 24 ê.**

| J. | Cureyê Rexneyê | Gotar li ser Çîrokê | Gotar li ser Kurte Çîrokê | Gotar li ser Helbestê | Gotar li ser Romanê | J. Gotaran |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | Dîrokî | - | - | 3 | 1 | 4 |
| | Civakî | 1 | - | 2 | - | 3 |
| | Hilweşîngerî | - | - | 1 | - | 1 |
| | Întîbaî | - | - | 3 | 1 | 4 |
| Sercem | | 1 | - | 9 | 2 | 12 |

Ji vê xiştey jî ji me re eşkere bû ku jimara gotarên rexneyê bi awayekî giştî dibin 12 gotar û ji wan jî ev in:

Çîrok 1 gotar in

Kurte Çîrok 0 gotar in

Helbest 9 gotar in

Roman 2 gotar in

Şano 0 gotar in

Wekî rêje, bo her cureyekê rexneyê li ser cureyên edebî hatine encamdan, em dikarin bi vî awayê jêrîn eşkere bikin:

**Xeşteya 25 ê.**

| J. | Cureyê Rexneyê | Rexneya Dîrokî | Rexneya Civakî | Rexneya Hilweşîngerî | Rexneya Întîbaî |
|---|---|---|---|---|---|
| | Çîrok | - | 33, 33 % | - | - |
| | Kurte Çîrok | - | - | - | - |
| | Helbest | 75 % | 16, 66 % | 100 % | 75 % |
| | Roman | 25 % | - | - | 25 % |
| | Şano | - | - | - | - |

Rexneya edebî wekî cureyên rexneyê, bi vî awayê jêrîn rêja wan eşkere dibe:

**Xeşteya 26 ê.**

| J. | Cureyê Rexneyê | Rêje |
|---|---|---|
| | Dîrokî | 33,33 % |
| | Civakî | 25 % |
| | Hilweşîngerî | 8, 33 % |
| | Întîbaî | 33, 33 % |

Bi giştî rexneya edebî li ser cureyên edebî wekî rêje bi vî awayê eşkere dibe:

**Xeşteya 27 ê.**

| J. | Cureyê rexneyê li ser hatiye encamdan | Rêje |
|---|---|---|
| 1 | Çîrok | 8, 33 % |
| 2 | Kurte Çîrok | 0 % |
| 3 | Helbest | 75 % |
| 4 | Roman | 16,66 % |
| 5 | Şano | 0 % |

| | | |
|---|---|---|
| | Sercem | 100 |

## 5.2 Nirxandina Gotarên Rexneya Edebî di Beşa Latînî ya Kovarê de

Gotarên rexneya edebî di beşa latînî ya kovarê de nirxandinê jê re bikin, ku rexnegirên me çawan karê rexneyê encam daye.

### 5.2.1 Nirxandina Gotarên Rexneya Dîrokî

Kerem Îbrahîm El-Yosiv gotareke bi navê *"Ew aşê derav lê wargêray bexçikek êşê dişewitîne"**. Di vê gorarê de rê û rêbazên rexneyê tevlihev kirine wekî Rexneya Întîbaî, civakî û dîrokî, lêbelê bêtir yasa û destûrên rexneya dîrokî di vê gotarê de eşkere dibin. Çunkî qala çaxê şoreşên kurdî dike, wan egeran eşkere dike ku çima rewşa kurdan ne baş e? Texa mela, axa û berjewendîvanan bûne eger ku kurd serbest nebin, dema dibêje:

*"Romanvan dixwaze ku ji nû ve cîhanekê ava bike lê cîhanekê ku kurd tê de serbest bin û roleke din tê de bileyzin, her weha ew nimûneyên sax diyar dike: Mela, axa, berjewendivan, eger van nimûneyan kar bo kurdayetiyê kirbana, dê rewşa kurdî anuha ne ev rewşa ba, belê di kûrahiya hevokên romanê de ew bêhna şoreşê heye, ev nimûne ku roleka qenc lîstin, rola wan dîsan heye û romanvan bi pênûs û dilekê şewat dinivîsîne..."*[30]

Helbet ev ravekirna li jûrî de diçe di çarçoveyê rexneya dîrokî de, her weha di hin aliyên din de peyva "Şoreş e, berxwedan e, serhildan e li başûra Iraqe".[31] Ev peyv koka rexneya dîrokî ne. Her weha rewşa kurdan dike, dema dibêje:

*"Hevoka ku wî dixwest ji dijminê kurdan re bêje ev bû û ew da ku dijmin nas bike, ku zîndan û mirin kurdan tune nakin, lê her ew hene, lê her ew hene û ew dozê bi hêz dikin: Ne bi eşkencedanê ne bi girtin û kuştinê û sêdaredanê, miletê me yê zindî û resen dimirît, ne şopa wî dihête guherîn, ne nasnama wî dihête berzekirin."*[32]

### 5.2.2 Nirxandina Gotarên Rexneya Civakî

Di gotarekê de bi navê "*Helbestvanê tepeser û hejaran (Letîf Helmet*)"* ji nivîsîna Xelîl Duhokî. Helbet her ji nav û nîşanê vê gotarê de eşkere ye, ku ev gotar diçe di çarçoveya rexneya civakî de. Anku hejarî bi xwe yek ji bûyerên civakî ye. Lewre mirov heta astekê vê gotarê bike di nava rexneya civakî de. Çunkî li gorî rexneya civakî her berhemeke edebî rengvedana civakî û xwezaya wî civakî û dab û nerîtan e û hwd. Îcar yek ji pirsgirêkên kurdan hejarî ye. Lewre me ev gotar kir di çarçoveya rexneya civakî de. Dema dibêje:

*"Ew bi hemî bawerî û boçûnên xwe ve, girêdayî texa bindest û hejar e. Ew ne bes guh dide pirtûk û teoriyan, belku di piraktîkî de jî, digel tepeser û rûtên welatê xwe ye. Ew baş agehdarî kawdanên hejara ye, çinku di rojên Hotêlên here erzan de, bi tinê jiyaye û derdê feqîrtiyê û dûriyê kêşaye û dîtiye. Ew bihayê nanî dizane û dehan cara li kolanên xerîbiyê birçî bê xwedî maye. Lê bi rastî helbestvanekê cerg asne û tisê rê ...."* [33]

---

* B. N. R. Wêneyê J.20 ê

[30] Kerem Îbrahîm El-Yosiv, *Ew aşê derav lê wargêray bexçikek êşê dişewitîne*, K. Peyv, J. 36, 2006, r.10-11

[31] H. Ç. r. 11

[32] Kerem Îbrahîm El-Yosiv, *Ew aşê derav lê wargêray bexçikek êşê dişewitîne*, K. Peyv, J. 36, 2006, r. 12

* B. N. R. Wêneyê J.16 ê

[33] Xelîl Duhokî, *Helbestvanê Tepeser û Hejaran (Letîf Helmet)*, K . Peyv, J. 30, 2004, r. 7

Di vê paragrafa jorîn de bûyerê civakî tên pêşberî me. Anku ev rengvedana civakî nivîskarî ne. Anku nivîskar qala derdê texa hejar û bindestan dike, dema dibêje: “Ew bi hemî bawerî û boçûnên xwe ve, girêdayî texa bindest û hejar e.” Lewre ev gotar diçe di çarçoveya rexneya civakî de. Her weha di vê gotarê de rexnegirî pesnê helbestên hellbestvanî kiriye. Ew yek eşkere kiriye, ku helbestên wî tam û xweş yeka baş didin xwendevanî, dema dibêje:

*“Nivîsîn li ser helbestên Letîf Helmetî, çêj û tameka taybet dide mirovî, çunkî ew bi zimanekê sivik û rewan dinivîsîne û her zû xwendevanî radikêşe cîhana berhemên xwe... Ew mîna sitêreka geş li esmanî geşe dike ...”*[34]

Helbet ev bîr û boçûnên rexnegirî ne li ser helbestvanî. Anku têkstê li ser rexnegirî eşkere dibe û rexnegirî li gorî hest û sozên xwe helbest rexne kiriye, dema dibêje: “*Nivîsîn li ser helbestên Letîf Helmetî, çêj û tameka taybet dide mirovî*.” Helbet hest û soz diçin di çarçoveya rexneya întîbaî de. Her weha rexnegirî nirxandin û biryardan li ser helbestvanî kiriye, dema dibêje: “*Ew bi zimanekî sivik û rewan dinivîsîne*.” Helbet ev bîr û boçûnên rexnegirî ne. Lewre di çarçoveya rexneya întîbaî de ne. Her weha di aliyekê din de rexnegir pesnê helbestvanî dike, dema dibêje: “Ew mîna sitêreka geş li esmanî geşe dike...”. Helbet pesinkirin binema û yasa û destûrên rexneya întîbaî. Rexnegirî di vê gotarê de îşaret bi cureyê rexneyê nekiriye. Anku ew yek eşkere nekiriye, ku helbest li gorî tu rê û rêbaz rexne kiriye. Lêbelê di vê gotarê de rexnegîrî çend rê û rêbazên rexneyî li ser helbestî piraktîk kirine Rexneya Întîbaî, Rexneya Civakî….hwd. Helbet ev yek ji bal me astengek bû ji bo cudakirinê. Lê belê yasa û destorên kîjan rê û rêbazê bêtir hatin karanîn ew hilbijartiye.

### 5.2.3 Nirxandina Gotarên Rexneya Bandûrî

**Lokman Polat** gotarek bi navê “*Rewşa helbesta kurdî a nûjen*”* belav kir. Di vê gotarê de qala rewşa helbesta kurdî dikir li Bakûrê Iraqê. Nivîskarî li gorî bîr û boçûnên xwe qala rewşa helbesta kurdî li Bakûrê Iraqê kiriye. Bê ku ji çavkaniyekê bike belge. Lewre ev gotar diçe di çarçoveya rexneya Întîbaî de. Her weha çunkî yasa û destûrên rexneya întîbaî di vê gotarê de tên eşkerekirin, dema dibêje:

*“Dîroka Rojhelata Navîn de helbesta kelasîk a kurdan û farsan dewlemend e. Helbesta tirkan a kilasîk tune ye.”*[35]

Helbet nivîskarî li gorî bîr û boçûnên xwe biryar daye. Ne li ser esasekê akademîk biryar daye. Di vir de li ser tu esasekê edebiyata kilasîka kurd û farsan dewlemend e û ya turkan tune. Helbet ev bîr û boçûnên nivîskarî ne. Her weha di cihekî din de bîr û boçûnên taybet bi nivîskarî re eşkere dibin, dema dibêje:

*“Helbesta kurdî a nûjen li Iraqa Bakur gelek qels e. Li Kurdistana Başûr û Rojhelat xurt e. Li Kurdistana Bakûr roman û çîroka modern pêş ketiye, lê helbesta nûjen pêş neketiye.”*[36]

Her weha nivskarî pesnê sê helbestavanan kiriye. Ev yek diçe di çarçoveyê rexneya întîbaî de, dema dibêje:

---

[34] H. Ç.r. 3

* B. N. R. Wêneyê J. 18 ê

[35] Lokman Polat, Rewşa Helbesta Kurdî a Nûjen, K. Peyv, j. 37, 2006, r. 13

[36] H. Ç. r 13

*“Di nav helbestvanên Iraqa Bakûr de sê jin hene hêjayê pesnê ne. Yek jê Fatma-Bozarslan e (Ew çû rehmetê) û ya din jî Diya Azad Acar e. Ya sêyem helbestvana jin ku niha li Amedê dimîne û navê wê Yildiz Akar e.”*[37]

Pêwîst e wê yekê eşkere bikin, ku rexnegirî bi awayekî durist li gorî rexneya întîbaî karê rexnê kirîye. Anku bi tenê taybetmendiyên rexneya întîbaî di vê gotarê de tên dîtin.

### 5.2.4 Nirxandina Rexneya Hilweşîngerî

Sebrî Silêvanî gotareke bi navê “*Ehmedê Huseynî şêxê helbestvanên Kurd*”[*] belav kir. Ev gotar li gorî rê û rêbazekî nehatibû şirovekirin. Rê û rêbaz tevlihev kiribûn. Lêbelê yasa û destûrên rexneya hilweşînger bêtir ji hemû yasa û destûrên rêbazên din di vê gotarê de eşkere dibin. Anku bîr û boçûnên Haydgrî di vê gotarê de eşkere dibin. Helbet çavkaniya Hilweşîngeran ji bo bîr û boçûnên Haydgrî dizivirin, dema dibêje:

*Hayîdger dibêje: Helbest dikare welatên azad ava bike, çendîn yarên bedew peyda bike, dikare jiyanek nû dest pê bike..*[38]

Ji bal hilweşîngeriyan têkst xwedî watayeke veşartî ye. Pir xwendin jê re tên kirin. Ev yek ji Haydger û hevalên wî re hatiye wergirtin. Her weha girîngî bi zimanî daye. Îcar girîngî dan bi zimanî yek ji taybetmendiyên Hilweşîngeriyê ye:

*Ez bawer dikim sê layê mukum: Giyan, hizir û ziman, pêkhateya serekî ye di helbesta Şêx Ehmedê Huseynî de: Min nedizanî ku ez ewqas bêriya goristana bajarî bikim. Eger li roja pêncşembe tu çûyî seredana dayka min, kêstekên li dora gorrê bigivêşe da ku nalîna min bihê veşandin.*

*Demê ku tu ji gorstanê vedigerê , tu rêya xwe bi kolana me biêxî: Li ser dergêhê hewşê, çavên min dalaqandî ne, wan biramûsê daku zuha nebin..tika dikim.*[39]

Di dawî de ew yek eşkere dibe, ku rexnegirî bi awayekî eşkere îşaret bi cureyê rexneyê nekiriye. Lêbelê binemayên rexneya hilweşîngerî û întîbaî tên tîtin. Anku rexnegirî cureyên rexneyan tevlihev kirine. Lêbelê bi awayekî baş binemayên rexneya hilweşîngerî tên dîtin.

## 6. ENCAM

1. Kovara Peyv bi awayekî akademîk di 1993an de, ji bal YNK-Duhokê derketiye holê. Lêbelê berî vî çaxî 1980î de bizaveka bi vî awayî hebû bi navê Peyv ji bal YNK-Duhokê. Lêbelê nekarîn wekî kovar biweşînin. Çunkî ji bal dewleta Îraqî weşandina rojname û kovaran yasax bû. Lewre li bin navê Ehmed Ebdulla Zero derket holê. Çunkî wî çaxî de ew Serokê YNK-Duhokê bû. Helbet ev belavok bû. Ne kovar. Çunkî di pêşgotinê bi xwe de ev yek eşkere kiriye.
2. Yasa û destûrên rexneya Dîrokî, Civakî, Psîkolojî, Bandûrî, Şêwazgerî, Simiyolojî û hwd. di kovara Peyvê de tên dîtin. Her weha di pişka latînî de yasa û destûrên rexneya dîrokî, civakî, bandûrî, hilweşîngerî hwd. tên dîtin.
3. Rexne di kovar û rojnameya devera Badînan de di nava 1991-2003an de rexneyeke pesnê û şikandinê bû, rexneya akademîk ya lawaz bû.
4. Di nava gotarên rexneya edebî di kovara Peyv de pir cureyên rexneya edebî hatin karanîn. Lêbelê ya bi awayekî baş hat karanîn Rexneya Bandûrî bû. Ku rexnegirî li gorî hez û arezûyên xwe têksta edebî rexne dikir.

---

[37] H. Ç. P . r. 14

[*] B. N. R. Wêneyê J.23 ê.

[38] Sebrî Silvanî, Ehmedê Huseynî Şêxê Helbestvanên Kurd, K. Peyv, J. 32, 2005, r. 9

[39] H. Ç. r. 9

5. Devera Badînan li qonaxa piştî Serhildana Başûrî Iraqê pêşkeftin ji xwe re anî. Lebelê di asta pêdivî de tune bû. Anku rexneya wan li gorî rê û rêbazên rexneyê lawaz bû. Nemaze rê û rêbazên rexneyê tune bûn. Lêbelê piştî çaxê 2003an bêtir qeşekirin ji xwe re anî û rê û rêbazên rexneya nû tên dîtin. Lêbelê bi awayekî teorî qala wan hatiye kirin. Di warê piraktîkî de di asta pêdivî de tune ye.
6. Di nirxandina gotarên rexneya edebî di kovara Peyvê de bêtir ew rê û rêbazên rexneyê tên dîtin. Ku girîngî bi aliyê derveyê têkstê didin.
7. Her weha rexnegirên me kesanên şehreza û pispor tune bûn. Belku helbestvan e û karê rexneyê dike.
8. Di aliyê tîpên kurdî ên erebî û latînî de ji rexne ji helbestê, çîrokê, romanê, kurte çîrokê û şano hatine kirin. Lêbelê bêtir li ser helbestê hatin kirin. Bi awayekî kêm rexne li roman û şano û kurte çîrokê hatiye kirin. Belku bêtir rexne ji helbestê hatiye girtin.
9. Di aliyê tîpên kurdî ên erebî de teoriyên rexneyê ên kilasîk wekî: Rexneya Dîrokî, Civakî, Piskolojî û Întîbaî pirtir ji Rexneya Modern û Postmodern hatine karanîn. Anku ew teoriyên girîngî bi têksta edebî û xwendevanî didin kêm hatin karanîn. Bêtir ew teoriyên rexneyê girîngî bi nivîskarî didin bêtir hatin karanîn di kovarê de. Her weha pêwîst e qala wê yekê bikin ku rexneya întîbaî û rexneya rexneyê bi awayekî baş hatine karînan. Em dikarin bibêjin ku bêtir ji hemûyan hatine karanîn di kovarê de. Her weha di beşa latînî de teoriyên rexneyê hatine karînan wekî rexneya dîrokî, civakî, hilweşîngerî û întîbaî hatin karanîn. Lêbelê bêtir rexnê întîbaî hatiye karanîn.

**ÇAVKANÎ**


Akalın, H. (2011). *Türkçe Sözlük*, Turk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2011.

Alan, R. (2015). *Destpêkek ji bo Zansta Edebiyata Modrên*,Weş. Peywend,Ç.Yekem, Stenbol.

Awla, F.İ. (2017). *Di Edebiyata Kurdî ya kevin û nû da Erkên Rexneyî,* T. Lîsansa Bilind, Z. Yuzhuncuyilê, F. Zimanên Zindî, Wan.

Balayî, N. (1991). *Hozanvanê Mirovayetiyê Edonîs Budurîs*, R. Botan, Duhok, J. 1.

Balayî, S. (2005). *Aştî Germavî li bersivan digerêt* !!, K. Peyv, J. 32, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Balayî, S. (2006). *Nizar ...Havîbûn...Hejmar sêzde*, K. Peyv, j.37, jiweşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd- Duhokê.

Balayî, S. (2007). *Bîrewerî û Havîbûn di Efsaneya Stranên Bindestiyê da,* K.peyv, J. 41, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Berzincî, E.S.E (2004). *Sercemî Berhemî Şakir Fetah*, B.2ê, Weş. Ares, çi1ê, Hewlêr.

Berzincî E. T. (2014). *Çend Tiwêjîneweyekî Rexneyî*, ji weşanên Ekadimiya Kurdî, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr.

Bedel, S. M. (1993). *Hozan û kawdanên wê* , K.Serheldan, J. 2, Weş. Rewşenbîrî, Hewlêr.

Berzincî, Ö. M. (1973). *Rexney Edebî* ,K. Nûserî Kurd(Kovarî yêketî Nûseranî Kurd), J. 8 Weş. El-Zaman, Bexdad.

Beşîr, K. H. (1993). *Mêjûy Rexne Sasî*, B. Yekem, Ji Weşanên Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinewey Kurdî, Weş. Dar El- Hurî ye, Bexdad.

Beşîr, K. H. (1981). *Lasayîkirdinewe û Resenî le Rexnezaî Kurdî da*, K. korî Zanyarî Îraq (destey kurd ), J. 8, B. 8,Weş. Korî Zanyarî Îraq, Bexdat.

Biyanî, K. C. (1992). *Têkilî di navbera Çîrokê û Xwendevanî de*, K. Nuxaz, J. 3, Duhok.

Cefer, H. (1992). *Hêma jimarê û Mem û Zîn*, K . Nuxaz, J. 3, Duhok,1992

Cefer, H. (2005). *Jin û bizava jinê di hozanên CegerXwên da*, K. Peyv, J. 34, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê,2005.

Cewahiri, F. (1998). *Hawar Cild 1-23 ( 1932-1933 ),* Weş. Nûdem, Stockholm, R.27.

Cewahiri, F. (1998). *Hawar Cild 2, J. 24-57(1934 – 1943 ),* Weş. Nûdem, Stockholm, R 813.

Çalî, Ş. (2008). *Şêwazî şî'rî Cizîrî*, Ji weşanên dezgehê Sipîrêz, Weş. Hacî Haşim,Ç. Yekem, Hewlêr.

Dartaş, A. (1999). *Deq û Rexne : Terim di mal avahiya edebî ya elhoda*, K. Biyaf ,J. 1, Ji weşanên Bizaba Rewşenbîrî- Akrê, Weş. Zankoya Selahedîn, Hewlêr.

Doskî, T. Î. (1994). *Ji deftrera hizir û bîran*, R. Peyman, J. 3, ji bal Dezgehê Xanî yê Rewşenbîrî û Ragehandinê di hê weşandin, Duhok.

Doskî, T. Î. (2008). *Şerha Mela'ebdilselamê Cizîrî û kurte bersiveka fer,* K. Peyv , J. 38, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Duhokî, X. (2004). *Helbestvanê tepeser û hejaran (Letîf Helmet)* , K. Peyv, J. 30, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Ebdulxefur, H. E. (2007). *Binema Reneyiyekanî Rexney Edebî Kurdî le 1920- 1962*, T. Lisansa Bilind, Z. Selahedîn, F.ziman, Hewlêr.

Ebdilqadir, E. (2012). *Bi be Rexnegir û kartêkirnê li Jiyanê bike*, weş. Xanî, Duhok, Ç.Yekem.

Ebdullah, Î (2013). *Şêwazgerî Ladan*, weş. Lerya, Ç. Yekem, Silêmanî.

Ebdullah, S. M. (2014). *Rehindî Rexneyî le Kovarî Ayînde*, Weş. Kro, ç.Yekem, Kerkuk.

Ebdulrehman, F. (2014). *Çemkî Felsefey Lêgdanewegerayî le Rexney Edebî da*, K. Nuser, J.10, Weş. Yeketî Nuseranî Kurd-Silêmanî, 2014.

El-Yosiv, K. Î. (2006). *Ew aşê derav lê wargêray bexçikek êşê dişewitîne,* K. peyv, J. 36, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê .

Emîn, K. K. (2009). *Arastekanî Rexney Şî'rî Kurdî* ,T.Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr.

Emîn, K. K. (2010). *Rexney Rexne (Erik û Binema),*K. Raman Weş. Xanî, Duhok, J.154.

Eswed, N. E. (2011). *Ferhengî Zarawey Edebî û Rexneyî* , weş, Bînayî, Silêmanî.

Eswed, N. E. (2014). *Girîngî Mîtod le Rexney Edebî da*,K. Nûser, J.10, Ji weşanên Yeketî Nûseanî Kurd- Silêmanî.

Findî, R. (2007). *Xwendinek di layê Edebiyê Şêx Memduhê Birîfkî da* , K. Peyv , J. 40, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Gerdî, E. (1974). *Rexne û Edeb*, Weş. El- Hewads, Bexda, Ç.Yekem.

Germiyanî, A. (2013) *Xesletekanî Rexne,* K. Peyv, Jiweşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd- Duhok, j. 64.

Hacî, E. (2008). *Çend Tiyorekên Rexneya Edebî*, ji weşanên dezgehê Spîrêz, Weş. Xanî, Ç.Yekem, Duhok.

Hesen, S. M. (2004). *Xwendinek bo Dû Kurte Çîrokên Gelek Kurt*, K. Peyv , J. 30, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Hesu, M. (1994). *Laliş di Hozanên Kurdî de*, K. Laliş, Ji weşanên merkezê Rewşenbî ê Laliş, Weş. Rewşenbîrî, Hewlêr.

Himê, B. Î, (2014). *Rexneya Civakî di Romanên Hesenên Metê da*, T. Lîsansa Bilind, Z. Mardîn Artuklu, Enitîtuya zimanên zindî li Turkiyê.

Hizirvan (1992). *Mamê Yaqîb û Ceveng Vekirin*, K.Nuxaz, J.3, Duhok.

Hîtu, A. (2006). *Rexne û Hêrişkirin*, K. Peyv, J. 38, Ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd- Duhokê.

Hîtu, A. (2005). *Xwendinek Derûnî* – Civakî bo Çîroka yan Ez yan hîç, K.Peyv, J. 34, Ji weşanên Yeketiya Nivîskarên - Duhokê.

Hurmî, H. (2006). *Aşqê Kulîlkan Xwandinek di Helbestên Eskerê Boyik da*, K. Peyv,J. 39.

Husênî, H. (2007). *Derwazeyek bo Rexney Edebî Kurdî*, ji Weşanên Dezgehê Tiwêjînewe û Belawkirdinewey Mukiryanî, weş. Xanî, ç.Yekem, Duhok.

Îbrahîm, M. E. (2012). *Pêkhatey Zimanî Şî'rî le Riwangey Rexney Edebî Niwêwe(Ezmûnî Şa'ranî Heştayekanî Hewlêr wek nimûne),*weş. Mukiryanî, Ç.Yekem, Hewlêr.

Îbo, N. E. (1991). *Dildar û Siroda ey Reqî*, K . Tîroj, J. 2, Sêmêl- Duhok.

Marînî, T. (2014). *Zanstên Rexneyî*, Ji weanên Yeketiya Nivîskarên Kurd- Duhok, Weş. Parêzgeha Duhokê, Duhok, Ç. Yekem.

Mehmod, F. M. û Mihemed, M.M.C (2010). *Binyadgerî le Edebî Kurdî* da, K . Zankoy Silêmanî, J. 29 .

Mehmud, A. E. (2009). *Bunyatî ziman le Şe'rî Hawçerxî Kurdî da*, Ji weşanên Ekadimyay Kurdî, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr.

Mentik, H. (2014). *Mîtodî Rrexney Derûnşîkarî*, Dîdarî Rexney Edebî kurdî, ji weşanên YNK, eş. Roj helat Hewlêr.

Mentik, H. (2013). *Sereta Diyalog Hebû (Tiwêjînewe û Rexny Edebî)*, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên kurd- Hewlêr, weş. Rojhelat,,Ç. Yekem Hewlêr.

Meruf, K. (2012). *Tiyore Niwêyekanî Rexney Edebî*, weş. Lerya, Silêmanî.

Meruf, K. (2010). *Mîtodî Rexney Mîjûyî*, K. Mêrig, J. 62, Ji Weşanên Dezgehê Mêrig, Weş. Mêrig.

Mihemed, F. R. (2004). *Rexney Romanî Kurdî le Îraq 1973-1999*,T. Doktora, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr.

Mihemed, Ş. (2009). *Rexney Binyadgerî le deqî şî'rî Namey Sûr î Dilşad Ebdula da*, K. New Şefeq, J.74.

Mistefa, C. (2005). *Axiftin û nivîsîn û cudahî*, K.Peyv,J. 32,Ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd- Duhokê.

Mistefa, E. (2015). *Rexneya Civakî bo karê Edebî*, K.Peyv, J. 70, Ji weşanên Yeketî ya Nivîserên Kurd-Duhok.

Mişextî, K. Î. (2011). *Sîmyolojiyay Zimanî Sofîgerî le Şî'rekanî (Melay Cizîrî ) da*, Ji Weşanên Dezgehê Spîrêz, Weş. Xanî, Ç.Yekem, Duhok.

Mişextî, M. K. Î (2011). *Ji Girftên Pênasekirin a Rexne ya Edebî*, K. Rûgeh, Zanîngeha Zaxo derdixe, J. 1.

Nihêlî, N. H. (2005). *Pêlên Rexneyî (Komeka vekolînaye di têkistêda)*, Ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhok, weş. Hawar, Ç. Yekem, Duhok.

Nihêlî, N. H. (2005). *Sîmayên Rexneyî di Hilweşîngeriyê da*, K. peyv, J. 32, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd- Duhokê ye.

Nihêlî, N. H. (2007). *Awazên Xamey*, weş. Hawar, Duhok, Ç.Yekem.

Nihêlî, N. H. (2007). *Şêwazgerî (Tiyorî û Piraktîkî ),* ji weşanên Dezgehê Spîrêz, Weş. Hecî Haşim, ç. Yekem, Hewlêr.

Nihêllî, N. H. (2007). *Kesatiya Sinêlê Kurd di Heyranokan da*, K. Peyv, J. 41, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Nihêllî, N. H. (2007). *Serbora “ Hizirvanî “ di gel leşê mê*, K. Peyv, J. 39, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Nihêllî, N. H. (2006). *Mîkanizma alugurkirina ranawan li çem Amîna Zikrî,* K. Peyv, J. 38, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Nihêlî, N. H. (2010). *Deravek ji Rexnê (Rexne û Vekolîn )*,weş. Hawar, Duhok, Ç.Yekem.

Nihêlî, N. H. (2013). *Piraktîzekirina Rexneya Nû ya Englu Emrîkî li ser têkistên girupa nûkirin Her û Her*, Ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê ye,Weş. Hawar, Duhok, Ç. Yekem.

Nihêlî, N. H. (2014). *Zalbûn a Cemserê Nivîserî di Rexneya Kurdî da*, K.Hîzil, J. 27 , Weş. Xanî , Duhok.

Omer, P. M. (2012) .*Riwangey felsefe bo Hilweşîngerayî*, K.Rûgeh, J. 4, Ji Weşanên Zanîngeha Zaxo ye.

Ormanî, N. S. T. (2009). *Nav û nîşan weku nasnama Têkstê Hozanê* , Ji weşanên Metîn, Weş. Hawar, Ç. Yekem, Duhok.

Polat, L. (2006). *Rewşa Helbesta Kurdî a Nûjen* , K. Peyv, J. 37, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Rêkanî, H. (1998). *Newroz le Helbestekanim da*, K. Maf,J. 21, Weş. Hawar, Duhok.

Resûl, H. B. (2012). *Rehendî Derûnî le Çîrokekanî Şêrzad Hesen da*,Weş. Mukuryanî, Hewlêr, Ç. Yekem.

Reşîd, M. C. (2009). *Mêjûya Kêşnasiyê di Hozan a Kurdî da*, T. Lîsansa Bilind, Z.Duhok,F. Adab.

Salih, A.K. (2010). *Rexney Komelayetî û piraktîzekirdinî le Şî’rîekanî Goranda*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr.

Seîd, Î. Î (2005). *Edebî Rojnamenosî Kurdî Bexda*, Ji weşanên Dezgehê Rewşenbîrî Belawkirdinewey Kurdî, Weş. Îlaf, Bexda.

Selîm, E. M. (1992). *Hozaneka ne belavkirî ya Nalbendî*, K. Raste Rê, J.5, Ji weşanên Yeketiya Zanayên Îslamê – Leqê Duhok û Mûsil.

Sicadî, A. (1969). *Nirix û Şinasî*, Weş. Me’ruf, Bexda.

Silêvanî, X. E. (2007). *Rexneya Edebî û Saloxetên Rexnegirî*, K.Raman, J. 120, Weş. Xanî, Duhok.

Silêwe H. (2013). *Xorî Deq û Awêzey Rexne*, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr.

Siltan, E.X. (2005). *Peyvên bê Perde*, Weş. Xanî,Ç. Yekem, Duhok.

Silvanî, S. (2005). *Ehmedê Huseynî şêxê helbestvanên Kurd* , K. Peyv, J. 32, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Şarezûrî, Y. L. (2015). *Diyardegerayî û Rexneya Edebî* , Weş. Hêvî, Hewlêr, ç.Yekem.

Şêrîn, Q. (2007). *Nirxandina Tirsa bê diran*, bi du çav û du hestên cuda, K. peyv, j. 40, weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Teîb, H. S. (2006). *Binyadgerî di nav rexne a kurdî da (ji despêkê heta sala 2003) ê* , ji weşanên dezgehê Sipîrêz ya çap û weşanê , Weş. Hacî Haşim, ç.Yekem, Hewlêr.

Teyîb, M. (2008). *Ronkirin li ser şerha Mela 'ebdulselamê Cizîrî*, K. Peyv, J. 38, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Tiha, A.İ. (2002). *Rengvedana Edebî di Kovara Hawar da 1932- 1942*, Ji weşanên Dezgehê Aras, Weş. Wezareta Perwerde, Ç. Yekem, Hewlêr.

Qoçanî, M. (2006). *Hevpeyvîn, Ber. Liqman Asahî*, K. Peyv, J. 38, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Qadir, R. X. (2009). *Mêtodî Rexney Tewawkarî(El-Tekamilî) le Rexney Edebî Kurdî da*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr.

Qadir, R. X. (2010). *Rexne le Nêwan Zanst û Hunerda*,K.Raman, J.163, Weş. Xanî, Duhok.

Qasim, N. (2016). *Rehindekanî Mîtodî Rexney Derûnî le Edeb da* , K.Raman, J. 227, Weş. Xanî, Duhok.

Qeredaxî, E. (1981). *Qutabxaney Şîkirdinewey le Rexney Edebî da* , K .Yekêtî Nûseranî Kurd, J. 6, Weş. El- Hewadis, Bexdad.

Xabur, S. (2012). *Edebiyet û Rengvedana wê di Heftînama (Peyman) da*, Weş. Zankoya Duhok, Ç. Yekem, Duhok.

Xazî, Ç.S. (2008). *Arastên Teknîkî di Şi'ra Nû ya Kurdî da Devera Badînan (Bedirxan Sindî wekî nimûne),* Ji weşanên dezgehê Sipîrêz, Weş. Hacî Haşim, Ç.Yekem, Hewlêr.

Xelat, E. (2006). *Helbestvanî ne di bikaranîna bitîna gotinê de ye* , K . peyv, J. 38, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Xelîl, R. (2011). *Mîtodî Rexney Derûnî le Biwarî Edeb da*, K. Raman, J.170,Weş. Xanî, Duhok.

Xembar, K. (2009). *Tengejey Rexne le Tengijey Rewşenbîrî da ye*, K. New Şeveq, J. 65, Kerkuk.

Yasîn, E. (2015). *Hindek Binemyên Rexn ya Binyadgerî*, K. peyv, J. 70, ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd – Duhokê.

Yusif, E. (2006). *Şerha Mela 'Ebdulselamê Cizîrî û karekê sexte*, K. Peyv, J. 37.

Zêbarî, E. Y. (2006). *Gotara vegêranê di helbestên ('Arif Hîto) da*, K . Peyv, J. 3

Zeraq, D. (2008). *Nuredîn Zaza : Avangardekî Çîroknûsiya*, K. Peyv, J. 45, Ji weşanên Yeketiya Nivîskarên Kurd- Duhokê.

**Hevpeyvîn**

Hesen Silêvaneyî , Hevpeyvîn,16-1-2017- du şeme.

Fazil Omer (Dr.), Hevpeyvîn bi rêya feyc, 21-1-2017- Şeme.

Pîr Xidirê Silêmanî, hevpeyvîn, 20-2-2017- dû şeme.

Arif Hîto(Dr.),  Hevpeyvîn, 20-2-2017- du şeme.

Ehmed Ebdulla Zero, Hevpeyvîn, 7-5-2017- Yek Şem e.

Konê Reş, Hevpeyvîn, 27-6-2017- Sê Şeme.